# JI BO ZAROKAN



# KITÊBA PÎROZ

JI BO ZAROKAN KITÊBA PÎROZ

Ravensberger Bleiche 6 · 33649 Bielefeld
0521 947240 · info@clv.de · **clv.de**

**Christliche Literatur-Verbreitung**
Bücher, die weiterhelfen

# Kinderbibel kurdisch (Kurmandschi)

Paperback, 176 Seiten
Format: 14,8 x 21 cm
Artikel-Nr.: 256023
ISBN / EAN: 978-3-86699-023-4

Diese erste Kinderbibel in kurdischer Sprache (Kurmandschi-Dialekt) enthält 19 Geschichten aus dem Alten Testament und 14 Geschichten aus dem Neuen Testament, die kindgerecht erzählt werden. Jedes Kapitel enthält farbige, jedoch einfach gestaltete Bilder. Am Ende jedes Kapitels befindet sich ein kleines Wörterbuch mit Wörtern aus dem vorhergehenden Text auf Kurdisch, Türkisch und Deutsch.
Die Kinderbibel ist zum Vorlesen und Selberlesen für Kinder geeignet. Kaum einer von uns kann kurdischen Kindern das Evangelium in ihrer Sprache sagen, doch jeder kann kurdischen Kindern eine Kinderbibel schenken und ihnen damit eine Freude machen.

Wenn Sie ein "echtes" Buch bevorzugen oder diesen Artikel verschenken möchten, können Sie diesen Download-Artikel ggf. auch käuflich erwerben, solange verfügbar.

**Artikel ansehen auf clv.de**

# JI BO ZAROKAN
# KITÊBA PÎROZ

BI KURDÎ (Zaravayê Kurmancî)
Kurdish (Kurmanji Dialect)
Kurdisch (Kurmandschi Dialekt)

Hûn dikarin di derheqê wergerê de fikr û ramanên xwe ji me re binivîsin:

© Hoffnung und Leben e.V.
Komela Hêvî û Jiyanê
Postfach 10 13 82 · 33513 Bielefeld · Germany
E-Mail: Incilkurd@web.de · www.Hoffnung-Leben.info

CLV · Christliche Literatur-Verbreitung e.V.
Ravensberger Bleiche 6 · 33649 Bielefeld · Germany
www.clv.de

Çap / Druck: Çile / Januar 2018

256023
ISBN 978-3-86699-023-4

# Naverok


Gelî Zarokên Kurd! 5

**Peymana Kevin 7**

Dema ku Xwedê her tiştî afirandin 9

Destpêka xemgîniya mirovan 14

Nûh û Tofana Mezin 19

Wada Xwedê a Mezin ya Bona Birahîm e 23

Xwedê Hezkirina Birahîm Diceribîne 28

Lawê Tête Hezkirin Dibe Dîlek 32

Xwedê Ûsivê Dîl Xîretdar Dike 38

Dotmîrê Ku Ji Çem ve Hatiye 46

Dotmîrek Dibe Şivan 50

Oxir Be Fîrawûn! 55

Çel Sal 61

Rût: Çîrokek Evîniyê 69

Dawidê Şivanê Zarok 74

Qiral Dawid (Beşa 1) 80

Qiral Dawid (Beşa 2) 85

Ester a Qiralîçeya Xweşik 90

Zilamên ku Natewin 95

Danîêl û Kortala Şêran 99

Yûnis û Masiyê Mezin 103

**Peymana Nû** 109
Bûyîna Îsa Mesîh 111
Bona Îsa Demek Xerab 117
Mûcîzetên Îsa Mesîh 121
Samîriyiyê Qenc 125
Îsa Mesîh Bahozê Aş Dike 129
Keçika Vejiyayî 133
Îsa Mesîh 5000 Kesî Têr Dike 137
Îsa Mesîh Zilamê Kor Baş Dike 141
Îsa Mesîh û Lazar 145
Mirin û vejîna Îsa Mesîh 149
Avabûna Dêra Pêşîn 156
Saûl – Gurê Ku Bû Berx 161
Gernameyên Pawlos Yên Ditewişînin 166
Buhuşt, Mala Xwedê ya Nuwaze 171

## Gelî Zarokên Kurd!

Mizgînî li we be! Çavên me û gelê me ronî be! Bi keda dehsalan, em dikarin bibêjin gellek beşên Kitêba Pîroz, çîrok û methelokên Kelamê, di dîrokê de cara yekem bi zimanê dayika me, bi Zimanê Kurdî hate amadekirin. Êdî hûn dikarin bi zimanê zikmakî hînî aştiya Mesîh Îsa bibin, bixwînin û fam bikim. Xwezî li we, pîroz be li me hemiyan…

**Xûşk û Birayên Biçûk, Zarokên Delal!**
Ez jî mîna we bi zimanekî qedexe û bi çandekî veşartî hatim dinê. Baweriya min nehate pirsîn, hema raste rast li gor ola dê û bavê min hatim xwedî kirin û mezin bûm, bi zimanekî biyan perwerdê dîtim, bi zimanekî biyan jiyan û axifîm, xewnên min bi zimanekî biyan bûn. Ji ber ku min baweriya xwe ne hilbijartî bû, ol û baweriya dayik û bavê min bi min xerîb û çewt dihatin.

Rojekê Xelaskerê dinê Mesîh Îsa dinya min ronahî kir, Ruhê Xemrevînkar da dilê min, min aştî û aramiya rasteqîn nas kir. Min ji nû ve jiyanê nas kir, ez bi zimanê dayika xwe hînî dua û qesîdeyan bûm, Kelam çavê min yên bi ziman û baweriyeke biyan hatine kor kirin, bi ronahiya rasteqîn vekirin. Ez êdî bûbûm mirovek nû. Min bi caran Kitêba Pîroz xwend. Her ku xwendim, xurttir bûm, her ku xwendim hêza baweriya min dewlemend bû.

**Xûşk û Birayên Hêja!**
Çîrokên di vê pîrtûka de ne, ji ayetên dema ez di baweriyê de hê zarok bûm xwendime û di hişê min de mane, bandoreke

girîng li ser jiyana min kirine pêk tê. Xwestim ku bi zimanê dayika xwe ji xûşk û birayên xwe yê biçûk re amadekariyekê bikim ku bila ew jî bigihêjin aramiya Mesîh û bi zimanê dayika xwe baweriya rasteqîn û xelasiyê fêr bibin. Ez dizanim, ger hûn bi çavekî bêalî li van çîrokan binêrin, hûn ê jî hînî rastiyê bibin û hûn ê bibînin ku rastî çi qas şêrîn e.

**Dayik û Bavên Ezîz, Mamosteyên Delal!**
Bi navberiya pirtûkên biwêne xwendin bona zarokên me hê jî xweştir tê. Bi parvekirina van çîrokan bona zarokên me, dê bona we jî azmayîş û daxwaziyê pêk bîne.

Berî her tiştî, biparvekirina Gotinên Xwedê, dê têkiliya we û zarokên we paktir bibe û di ser de dê zarokên me Xelaskerê dinê Mesîh Îsa bi rastî binasin, qebûl bikin û bifikirin.

Ez wisa dua dikim ku bila zarokên me Hezkirina Xwedê, Gotina Wî û Xelaskeriya Mesîh Îsa qenc binasin.

Jê wêdetirê azadiya rasteqîn û aramiya mezin e…

Bimînin di xweşiyê de.

Amadekar

Peymana Kevin

## Dema ku Xwedê her tiştî afirandin

Gelo kî me afirandine? Kitêba Pîroz ya ku Gotina Xwedê ye, di derbarê destpêka zayenda mirovan de dibêje. Beriya gellek deman, Xwedê mirovê pêşîn afirand û navê Adem lê kir. Xwedê, Adem ji axê afirand. Dema Xwedê hilma jiyanê pif kir Adem, Adem bû afirek êdî dijî. Xwe li cihê ku navê wê Aden e û gellekî nuwaze ye dît. Xwedê, beriya ku Adem biafirîne, dinyayek seraza ya bi tiştên nûwaze ve tijîne afirand. Xwedê gav bi gav girên bilind, newalên berfireh û rast, çîçegên bêhnxweş û darên dirêj, civîkên per û bazkên wan şewle didin, mozên ku divizvizin, nehengên ku ajne dikin û qepûşkên şematok afirandin.

Birastî, Xwedê, hemî tiştên ku hene afirandin. Di destpêkê de, berî ku Xwedê her tiştî biafirîne, ji bilî Xwedê tu tiştek jî tunebû. Mirov tunebûn, cih tunebûn, tiştên din jî tunebûn. Ronî û tarî tunebûn. Erd û ezman tunebûn. Doh û sibê jî tunebûn. Tenê Xwedayê ku destpêka Wî nîne hebû. Paşê Xwedê dest bi afirandinê kir.

Di destpêkê de Xwedê ezman û erd afirandin. Û erd bê teşe û vala bû. Û balûpal bi tariyê dagirtî bû. Paşê Xwedê got: “Bila ronî bibe.” Û ronî bû. Xwedê navê roj da roniyê û navê şev da tariyê. Bû êvar û sibeh bû û roja yekem pêk hat.

Roja duyem, Xwedê avên okyanosan, behran û golan li gora rêzekê afirandin.

Roja sêyem Xwedê got: “Bila axa ziwa xuya bibe” û wisa bû. Xwedê wekî din bona nebatan, çîçegan, qirş û qalan û daran xuya bibin emir da û wisa bû. Şev û roj, roja sêyem bû.



Paşê Xwedê rojê, heyvê û stêrkên ku kes nikarin bijmêrin afirandin. Şev û roj, roja çaran bû.

Zindiyên di behrê da ne, masî û civîkan jî di lîsta paşê ya Xwedê da bûn.

Roja pêncemîn Xwedê masîşûrên mezin û masîwûrkên biçûk, hêştirmeyên çîp dirêj û civîkên biçûk yên bi dilgeşî diwîtin afirandin. Qandî ku avên li rûyê erdê ne dagirin gellek celebên masiyan û bona dilxweşiyê bidin erd û behr û ezmanan gellek celebên civîkan afirandin. Roj û şev bûn. Roja pêncan pêk hat. Paşî vê yekê Xwedê dîsa axifî. "Bila rûyê erdê afirê zindî pêk bîne…" Bi her cûreyê ajal, kêzik û marîjokan çêbûn. Fîlên ku ramanan bi serûbinî dikin û darbirên tevgerok jî hebûn. Meymûnên zexel û tîmsehên laşgiran. Kurmikên di cihê xwe de nasekinin û sihorîkên bêar, zurafeyên çîp dirêj û pisîkên dimirmirin. Di vê roja şeşan de her tewrên ajalan ji aliyê Xwedê ve hatin afirandin. Roj û şev bûn. Roja şeşan pêk hat.

Xwedê di roja şeşan de hinek tiştên taybet jî çêkirin. Bona mirov her tişt niha amade bû. Di zeviyan de xwarin û ajalên ku bona wî xizmetê bikin jî hebûn.

Û Xwedê: "Em di wekheviya xwe da mirov biafirînin. Bila bibe serwerê her tiştên li rûyê erdê ne." got.

**Bi vî awayî Xwedê mirov, di wekheviya xwe da afirand. Mirov di wekheviya Xwedê da hate afirandin.**

Xwedê, bi Adem re axifî: "Tu dikarî ji baxçê her tiştî bixwî. Lê belê ji darê qencî û xerabiyê zanînê ve nexwî. Ger tu ji wê bixwî, tuyê teqez bimrî."

Û Xudan Xwedê got: "Tenê mayîna Adem ne qenc e. Ez ê alîkarek li gor wî jê re biafirînim." Xwedê hemî civîk û heywanan anîn cem Adem. Adem nav da her yekî. Bona ku wisa bike divê gellekî biaqil bûya. Lê belê di nava civîk û heywanan da hevalek li gor Adem tunebû.

Xwedê xeweke giran da Adem. Hestiyek ji parsuyên wî rahişt û ji parsuyê jinekê afirand. Jinik hevala herî li cih ya ku Xwedê bona Adem afirandiye bû. Xwedê her tiştî di nava şeş rojan de afirandin. Paşê roja heftan pîroz kir û wê rojê mîna roja rawestandinê diyar kir. Adem û pîreka xwe di Bexça Adenê de bi îtaetkirina Xwedê, xwediyê bextewariyek bêkêmasî bûn. Xwedê, Xudanê wan, yê ku pêdiviyên wan peyda dike û hevalê wan bû.

**Dema ku Xwedê her tiştî afirandin**

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

Afirandin 1-2

*"Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne."*

Zebûr 119:130

**Dawî**

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

## Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin
## û bi Xwedê re biaxifin!

Yûhena 3:16

| Ferhengok Bi Kurdî | Mini Sözlük Bi Tirkî | Mini Wörterbuch Bi Almanî |
|---|---|---|
| Xwedê | Tanrı | Gott |
| Ezman | Gök | Himmel |
| Erd | Yer | Erde |
| Roj | Gün | Tag |
| Şev | Gece | Nacht |
| Mirov | İnsan | Mensch |
| Ajal | Hayvan | Tier |

## Destpêka xemgîniya mirovan

Dema Xwedê mirovê pêşîn, Adem afirand, Adem di Bexça Adenê de digel pîreka xwe Hawa re jiya. Heta wê rojê, bi îtaet-kirinê û ji ber kêfxweşiya hebûna Xwedê bextewariyek têkûzî dijiyan...



Mar ji Hawa re bi gotina: “Gelo Xwedê ji we re gote ji fêkiyên tu darên ku li bexçê ne nexwin?” pirsî. Hawa bi gotina: “Ji bilî yekî hûn dikarin fêkiyên her yekî bixwin” bersivand. “Ger em wê fêkiyê bixwin an jî destên xwe tê de bidin, em ê bimirin.” Mar bi gotina: “Hûn ê nemirin” lencînî, “Lê hûn ê bibin mîna Xwedê.”

Hawa fêkiya wî darî xwest. Mar guhdarî kir û fêkiyê xwar. Hawa çawa ku li dijî Xwedê rabû, hewl da û Adem jî fêkiyê xwar. Divê Adem: “Na! Ez li dijî gotina Xwedê ranabim” bigota.

Dema Adem û Hawa gunehê kirin, her duyan jî hay ji tazîbûna xwe çêbûn. Bi berdilkên ji pelên hêjîran ji xwe re dirûtine xwe nuxumandin. Û ji ber Xwedê, xwe di nava deviyan de veşartin. Di hênikayiya rojê de Xwedê hate bexçê. Bi kirina Adem û Hawa dizanîbû. Adem tawanbariyê li Hawa kir. Hawa tawanbariyê li mar kir. Xwedê: “Mar hate binalet kirin. Dema zarok bizên dê jin êşê bikêşe” got. “Ji ber ku Adem guneh kir, rûyê erdê bi kelem û deviyan ve hate binalet kirin. Tu bona ku nanê xweyî rojane bi dest ve bixî, tuyê kedê bide û tuyê xwêdana eniya xwe biherikîne.”

Xwedê Adem û Hawa derxist derve bexça ku nuwaze ye. Ji ber ku gunehê kirine, ji Xwedayê ku jiyanê daye cuda bûbûn! Xwedê, bona ku wan li derve bigire, şûrekî bi agir afirand. Xwedê bona Adem û Hawa ji çerman kincan çêkirin. Gelo Xwedê çerm ji ku ve anîbû?

Di dûmahîka deman de bona Adem û Hawa malbatek bû. Lawên wanî pêşiyê Kayîn, cotkarek bû. Lawên wanî duyem Habîl jî şivan bû.

Rojekê Kayîn, bona Xwedê mîna xelat be hinek sewzeyan anîn. Habîl ji herî qencên mîhên xwe hinekan, bi diyarî ji Xwedê re anîn. Xwedê ji xelata Habîl ve dilxweş bû. Xwedê ji xelata Kayîn ve kêfxweş nebû. Kayîn gellekî hêrs bû. Lê belê



Xwedê: “Gelo ger tu ya rast e bikî, ma ez ê te qebûl nekim?” got. Hêrsa Kayîn aş nebû. Paşî demek din di zeviyê de êrîşî Habîl kir û wî kuşt. Xwedê bi Kayîn re axifî: “Birayê te Habîl li ku ye?” Kayîn bi gotina: “Nizanim” derew kir. “Ma gelo ez notirvanê birayê xwe me?” Xwedê hunera cotkariyê ji Kayîn ve rahişt û wî bi kirina kesekî bê armanc digere, tawandar kir.

Kayîn ji hizûra XUDAN veqetiya. Bi qîza Adem û Hawa re zewicîbû. Malbatekê pêk anîn. Piştî demekê neviyên Kayîn û neviyên neviyên wî, bajarê ku wî ava kiriye dagirtin. Di heman demê de malbata Adem û Hawa bi lezî mezin bû. Di wan rojan de mirov, ji roja îroj dirêjtir dijiyan. Dema lawê wê Şît hate dinê Hawa: “Xwedê li dêvila Habîl Şît da min” got. Şît, mirovek rêzdariyê ji Xwedê re dike, 912 sal jiyaye û gellek zarokên wî hebûn.

Li dinê mirovan, çawa nifşeyek ya din dişopîne her ku çûn xerabtir bûn. Ya dawîn Xwedê bona tunekirina mirovahiyê biryarê da û hemî ajalan û civîkan jî. Xwedê ji ber ku mirov afirandiye xemgîn bû. Lê belê mirovek Xwedê dilxweş kir… Ev zilama Nûh bû, ji nîjada Şît. Nûh rast û bêsûc bû. Ligel Xwedê meşiya. Her sê lawên xwe jî fêr kirin ku ji Xwedê re îtaet bikin. Bi vî awayî Xwedê pêşniyar kir ku Nûh bi awayekî taybet û balkêş bi kar bîne!

**Destpêka Xemgîniya Mirovan**

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

Afirandin 3-6

*“Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne.”*

Zebûr 119:130

**Dawî**

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

---

Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin
û bi Xwedê re biaxifin!

Yûhena 3:16

---

| Ferhengok Bi Kurdî | Mini Sözlük Bi Tirkî | Mini Wörterbuch Bi Almanî |
|---|---|---|
| Adem | Adem | Adam |
| Hawa | Havva | Eva |
| Bexça Adenê | Aden Bahçesi | Garten Eden |
| Fêkî | Meyve | Frucht |
| Mar | Yılan | Schlange |

## Nûh û Tofana Mezin

Nûh, mirovek bi Xwedê ve diperiste bû. Hemiyên din ji Xwedê ve kerihîn û li dijî Wî rabûn. Rojekê, Xwedê tiştekî ku mirov şoke bike got: “Ez ê vê dinya xerab tune bikim.” Xwedê ji Nûh re: “Dê tenê malbata te xelas bibe!” got.

Xwedê di derbarê hatina tofaneke mezin û dagirtina wê ya rûyê erdê de Nûh hişyar kir. Bi gotina: “Keştiyeke darînî çêbike, bila keştiyeke qandî têra malbata te û gellek ajalî bike mezin be,” destûrê da Nûh.

Xwedê agahiyên bi biryarî dan Nûh. Nûh pê mijûl bû. Bi îhtimaleke mezin, dema mirov fêr bûn ku Nûh bona çi keştiyê çê dike qerf û qotên xwe pê re kirin. Nûh avakirinê domand. Û ji mirovan re di derbarê Xwedê de gotinê jî domand. Tu kesî wî guhdarî nekirin. Baweriyek mezin di Nûh de hebû. Çawa ku baran ji berê ve nebariye lê dîsa jî bi Xwedê ve bawer bû. Paşî demek kurt, keştî bi yên ku dê bêne peyda kirin tijebûnê ve amade bû. Bi vî awayî ajal hatin. Xwedê ji hinek celeban heft, ji yên din cot bi cot anîn. Civîkên biçûk û mezin, ajalên biçûk û dirêj ber ve keştiyê hatin.

Dibe ku dema Nûh ajalan li keştiyê siwar dikirin, mirovan heqaretê li wî kiribin. Dev ji gunehkirina li dijî Xwedê bernedan. Nexwestin ku bikevin keştiyê. Ya dawîn hemî ajal û civîk di keştiyê de bûn. Xwedê bi gotina: “Bikeve hundirê keştiyê!” Nûh vexwand; “Tu û malbata xwe!” Nûh, pîreka wî, her sê lawên wî û bûkên wî li keştiyê siwar bûn. Paşê Xwedê derî girt! Paşê jî baran hate.

Bi şev û roj çel rojî baranek dijwar li ser rûyê erdê ve bariya. Avên tofanê bi ser bajar û gundan ve bariyan. Dema baran sekinî, heta çiya jî di bin avê de mabûn. Her tiştên ku hilmê distînin mirin. Dema av rabû, keştiyê jî rakirin ber ve jor. Dibe ku hundirê wê tarî be, dibe ku xaro maro be û dibe ku tirsehêz be.

Piştî tofana ku pênc mehî dom kir, Xwedê bayekî ziwaker şand. Keştî hêdî hêdî li ser çiyayên Araratê gihaşt erdê. Nûh qelareşk û kevokekê ji şivaka keştiyê ya vekirîbû şandin derve. Ji ber ku cihek ziwa bona rawestinê nedît, kevok vegeriya Nûh. Piştî hefteyekê Nûh carekî din ceriband. Wê gavê kevok, di nava nikulê wê de pelek zeytûnê ya nû hatiye jêkirin şunda vegeriya. Hefta par, Nûh fam kir ku rûyê erdê ziwa ye, ji ber ku kevok venegeriyabû. Xwedê ji Nûh re, dema ji keştiyê derketinê êdî hatiye, got. Hemî pev re, Nûh û malbata wî ajalan derxistin derve. Xwedê zane Nûh bi çi hestên minetdariyê hês kiriye!

Pêşkêşîgehekê ava kir û ji Xwedayê ku wî û malbata wî ji vê tofana tirsehêz xelas kirine re peristinê kir. Xwedê wadek nûwaze da Nûh. Carekî din, bona daraziyê li gunehên mirovan bike, dê êdî tofanê neşîne.

Xwedê bona wada xwe tiştekî bibîr bixe ya mezin e da: Keskesor nîşana wada Xwedê bû. Nûh û malbata wî, paşî tofanê destpêkên nû dîtin. Di nava demê de nîjada wî hemiya dinê bi mirovan ve dagirtin. Hemî neteweyên dinê ji Nûh û zarokên wî pêk hatin.



**Nûh û Tofana Mezin**

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

Afirandin 6 - 10

*"Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne."*

Zebûr 119:130

**Dawî**

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

---

Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin
û bi Xwedê re biaxifin!

Yûhena 3:16

---

| Ferhengok Bi Kurdî | Mini Sözlük Bi Tirkî | Mini Wörterbuch Bi Almanî |
|---|---|---|
| Keştî | Gemî | Schiff |
| Baran | Yağmur | Regen |
| Çiyayê Araratê | Ağrı Dağı | Berg Ararat |
| Kevok | Güvercin | Taube |
| Keskesor | Gökkuşağı | Regenbogen |

## Wada Xwedê a Mezin ya Bona Birahîm e

Gellek demên piştî tofanê, mirovên li dinê ne planekê saz kirin: “Em ê bajarek mezin ya ku qûleya wê bigihêje ezmanan ava bikin” gotin. “Em her tim pev re bijîn.” Her kes heman zimanî diaxifîn. Xwedê xwest ku li her warê dinya ku afirandiye mirov bila bijîn. Bi vî awayî tiştekî taybet çêkir. Nişka ve mirovan bi koman dest pê kirin û bi zimanê cihê axifîn. Xwedê zimanên nû da wan. Mirovên ku bi heman zimanî diaxifin, pev re çûne cihekî cuda. Dibe ku ji mirovên din yên bi zimanên wan fam nakin tirsiyabin.

Bi vî awayî, Xwedê pêk anî ku mirov welatên cuda tijî bikin. Navê bajarê ku terikandin jî **Babîl ya wateya navê wê alozî ye bû.**

Paşî gellek salî li cihêkî ku wekî bajarê Ûr yê Kildaniyan tête nasîn Xwedê bi zilamekî ku navê wî Abram e re axifî. Bi gotina: “Ji van axan cuda bibe” emir dayê, “Here welatê ku ez ê nîşanî te bidim.” Abram îtaet pê re kir. Xwedê wî bir warê Kenanê. Pîreka wî Saray û biraziyê wî Lût jî bi wî re çûn. Dema li Kenanê bûn Abram û Lût, her du jî dewlemend bûn. Keriyên wan ên dewaran yên gellekî mezin çêbûn. Bona ev qasî keriyên mezin mêrgên qîm bike tune bûn. Şivanên Lût bi şivanên Abram re şer kirin. Abram got: “Bila pirsgirêk dernekeve, em ê ji hev veqetin. Lût, cihê ku dixwazî pêşiyê tu hilbijêre.” Lût newalek mezin û hêşîn ya dora wî bi gund û bajaran ve dagirtî hilbijart. Cihekî xweş xuya dike bû. Lê belê wan bajaran cihên xerab bûn.

Piştî cudabûna Lût, Xwedê dîsa bi Abram re axifî: “Ez hemiya axên Kenanê heta bêdawîbûnê didim te û zarokên te.”



Zarokê Abram û Saray tune bûn. Gelo dê Xwedê wada xwe ya mezin çawa bianiya cih? Sê zilam ji Xwedê ve bona Abram û Saray hatin. “Dê di gellekî nêzîk de pitikek we çêbibe” gotin. Saray keniya. Bi şandiyê Xwedê ve bawer nebû. Nod salî bû.

Xwedê ji Abram re: “Ji niha pê ve tu bi navê Birahîm (Bavê Gellekan) ve bête bang kirin û dê Saray jî mîna Sara (Dotmîr, prenses) bête bangkirin” got.

Xwedê ji Birahîm re têkbirin û tunekirina her du bajarî, Sodom û Gomora jî got. Biraziyê Birahîm Lût, tevî malbata xwe li Sodomê dijiyan.

Dema emirê Xwedê hate, Lût bawer bû, lê belê dergistiyên qîzên wî, ji Sodomê derketinê qebûl nekirin. Çi qasî dilsotîner



î! Bi Gotina Xwedê ve bawer nebûn. Tenê Lût û her du qîzên wî xelas bûn. Agir û kewkurd bi ser bajaran re bariya. Mixabîn, pîreka Lût li dijî hişyarkirina Xwedê ve derket û dema banz dida fitilî û li paşî xwe nihêrt. Bu sitûnek ji xwê pêk hatiye. Xwedê soza ku dabû Birahîm û Sara anî cih. Dema Îshaq bû, Xwedê zanî çi bextewar bûne! Dibe ku Birahîm jî di derbarê wada ku Xwedê warê Kenanê heta bêdawîbûnê bide wî û lawên wî de fikirîbû. Dê Xwedê vê wada xwe jî bianiya cih. Xwedê her tim wadên xwe tîne cih.

## Wada Xwedê a Mezin ya Bona Birahîm e

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

Afirandin 11-21

*"Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne."*

Zebûr 119:130

### Dawî

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha

bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

---

**Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin**
**û bi Xwedê re biaxifin!**

Yûhena 3:16

---

| Ferhengok Bi Kurdî | Mini Sözlük Bi Tirkî | Mini Wörterbuch Bi Almanî |
|---|---|---|
| Abram | Avram | Abram |
| Saray | Saray | Sarai |
| Lût | Lut | Lot |
| Şivan | Çoban | Hirten |

## Xwedê Hezkirina Birahîm Diceribîne

Şevekê Xwedê emirek bi Birahîm ve ecêb hate da. Ev bona dîtina, gelo Birahîm, ji Xwedê zêdetir ji lawê xwe Îshaq ve hez



dike an jî nake, ceribandinek bû. Xwedê bi gotina: "Lawê xwe Îshaq rahêje û wî wekî pêşkêşiya şewitandinê pêşkêş bike" emir da. Îshaq pêşkêş bike? Lawê xwe qurban bike? Bona Birahîm rewşeke dijwar bû. Gellekî ji lawê xwe hez dikir. Lê belê Birahîm, hê di demên ku fam nedikir jî bi Xwedê re ewlebûnê fêr bûbû. Sibehê ligel Îshaq û du xulamê xwe re ber ve çiyayê qurbanê dest bi rêwîtiyê kir. Beriya ku derkevin rê, Birahîm bona pêşkêşiyên şewitandinê êzing qelaştin.

Birahîm plansaziya ji Xwedê re îtaetê kir. Piştî sê rojî nêzîkî çiya bûn. Birahîm ji xulamên xwe re: "Li vir bimînin" got. "Em ê herin biperistin û şunda vegerin cem we." Îshaq êzingan kêşandin; Birahîm agir - û kêrekê kişand. Îshaq bi gotina: "Ma bona pêşkişiya şewitandinê ka berx li ku ye?" pirsî. Birahîm bi gotina: "Dê Xwedê bi xwe berxekê peyda bike" bersivand.

Her du jî hatin cihê ku ji aliyê Xwedê ve hatiye pejirandin. Li wê Birahîm pêşkêşîgehekê ava kir û bona qurbanê li ber Xwedê bişewitîne êzingan amade kirin. Birahîm gellek pêşkêşîgehan ava kiribûn. Helbet ku ev ya vê demê ya herî dijwartir bû. Birahîm Îshaq girê da û lawê xweyî xoşewîst danî ser pêşkêşîgehê.

Gelo dê Birahîm bi rastî jî îtaetê ji Xwedê re bike û lawê xweyî tekane qurban bikira? Belê! Devê kêrê, dema Birahîm wê berve jorê hilda, biriqî. Divê dilê wî bi kul û janê perpitî ba, lê belê Birahîm divêtiya ji Xwedê re îtaetkirinê dizanîbû.

Milyaketê Xudan bang kir: "BISEKINE!"

"Niha min fam kir ku tu ji Xwedê ve ditirsî. Te lawê xwe, lawê xweyî tekane ji min neparast."

Gava Birahîm di nava deviyan de beranekî dît, benên Îshaq vekirin û li dêvila wî beran qurban kir. Dibe ku Îshaq wisa fikirî be: “Xwedê mîna ku bavê min gotibû pêk anî.”

Dema bav û law diperistin, milyaketê Xudan bi birahîm re axifî: “Ji ber ku te îtaet kir, dê bi zarokên te re hemî neteweyan bêne pîroz kirin.”

Rojekê dê Îsa ji nîjada Birahîm ve bihata dinê. Birahîm û Îshaq şunda vegeriyan mala xwe. Paşî demekî din xemgînî hate. Sara çû ser heqiya xwe (mir). Birahîm, pîreka xwe wenda kiribû û Îshaq diya xwe wenda kiribû.

Piştî merasîma cenazeyê, Birahîm serekê xulamên xwe şande ku ji Îshaq re jinekê bibîne. Xulam, bona ku li welatê wanî kevin, di nava merivên Birahîm de qîzekê bibîne, çû.

Xulam nîşanekê ji Xwedê ve xwest. “Qîza ku bona deveyên min pêşniyara av (dayîn)ê bike, bila kesa rast be” got. Di heman demê de Rebeka pêşniyara avdayînê kir. Ew, yek ji merivên Birahîm bû. Xulam fam kir ku Xwedê bersivê daye dua wî. Rebeka, bona ku bi Îshaq re bizewice ji malbata xwe cuda bû. Paşiya mirina dayika wî, xemrevîniyê li wî kir. Îshaq çi qasî ji wê hez kir!

**Xwedê Hezkirina Birahîm Diceribîne**

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

Afirandin 22-24

*“Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne.”*

Zebûr 119:130

**Dawî**

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

---

Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin
û bi Xwedê re biaxifin!

Yûhena 3:16

---

| Ferhengok Bi Kurdî | Mini Sözlük Bi Tirkî | Mini Wörterbuch Bi Almanî |
|---|---|---|
| Birahîm | İbrahim | Abraham |
| Îshaq | İshak | Isaak |
| Law | Oğul | Sohn |
| Beran | Koç | Widder |
| Êzing | Odun | Holz |
| Qurban | Kurban | Opfer |

## Lawê Têtê Hezkirin Dibe Dîlek

Îshaq gellekî bextewar bû. Lawê wî Aqûp li malê bû. Heta Esavê bona kuştina wî sond daye jî bi qenciyê pêşwazî li birayê xwe kiribû. Lê belê lawên Aqûp ne bextewar bûn, ji ber ku Ûsiv, birayên wanî herî ciwan, lawê ku bavên wan gellekî jê hezdike bû.



Dema Ûsiv xewna xwe ji birayên xwe re got, birayên wî pê re xeyidîn. "Demeda zadê min rabû û çik sekinî û demedên birayên min bi rêzê bejin tewandin," got Ûsiv. Ev xewna dihate wê wateya ku dê Ûsiv ji birayên xwe ve bibe miroveke girîngtir. Di xewna duyem ya Ûsiv de, roj, hêyv û stêrkan hatin û li ber wî bejnên xwe tewandin. Heta bavê wî Aqûp jî, ji ber ku ew xwe ji dayik, bav û birayên xwe seretatir dibîne, ji wî enirî bû.



Rojekê Aqûp, Ûsiv şande zeviyê ku birayên wî, li wê, li pezên xwe dinêrin, birayên wî hatina wî dîtin; bi gotina "de ka em vî xeyal-perestî bikujin" kufkufîn. Haya Ûsiv ji xetera ku li benda wî ye tunebû. Rûben, birayê ku mezin bû, mîna wan nedifikirî: "Divê em xwînê nerijînin!" got; "Binêrin li vê kortalek heye. Em bihêlin bila li wê bimire!" Rûben pêşniyara şevê xelaskirina wî dikir.

Gava Ûsiv hate cem wan, birayên wî hema wî girê dan û kincên rengînî yê ku Aqûp bi taybet bona lawê xwe yê gellekî jê hez dike daye çêkirin ji wî kirin û rahiştin. Paşê wî avêtin hundirê wê kortala tirsehêz.



Gava Rûben tunebû, karwanek deveyan ya diçe Misirê nêzîkî wan hate; birayê wî Cihûda, "De ka em Ûsiv bifiroşin" got. Bazarî hatibû kirin, Ûsiv bi bist û pênc zîvî firotin.

Ûsiv bi hêstirên çavan û bi tirs, dema deveyê ku dihejiya wî ji malbata wî û welatê wî cuda dikir, bi çavên alîkariyê dixwaze li dora xwe dinihêrt.

“Ma ev kincê Ûsiv e? Bi xwîn e. Me vêya li çolê dîtin.” Birayên wî yên xedar, bi Aqûp dane bawerikirin ku lawê wî yê delal ji aliyê ajalekî hov hatiye kuştin. Aqûp cil û bergên xwe çirandin û dest pê kir û bi şînê girt. Tu kes nikarîbû xemrevîniyê li wî bike.

Dibe ku li Misirê Ûsiv tirsiyabe û xwe gellekî bêkes dîtibe. Dibe ku bêriya mala xwe kiribe. Lê belê nikarîbû bireviya. Li mala Potîfarê ku Misiriyekî girîng e, dîlek bû. Potîfar dît ku Ûsiv her tim gellekî dixebite û kesekî ewlekar e. Rojekê Potîfar ji Ûsiv re: “Her tiştê ku tu dikî gellekî qenc dibe” got. “Xwedê bi te re ye. Ez dixwazim ku tu bibî berpirsiyarê hemî karên min û wekî efendiyê hemî xizmetkarên min yên din, bibe serxizmetkarê min.”

Xwedê ji ber Ûsiv, zadên qenc û gellek dewlemendiyan da Potîfar. Ûsivê ku niha mirovekî girîng e hê mirovekî ewlekar û bi dilsozî xizmetê ji Xwedê re dike bû.

Lê belê pirsgirêkek derket ber Ûsiv. Pîreka Potîfar jinikek xerab bû. Xwest ku bila Ûsiv cihê mêrê wê bigire. Ûsiv wê red kir. Nexwest ku xeletiyê li Potîfar re bike û bi vî awayî li dijî Xwedê gunehê bike. Dema jinikê zorê da wî, ew reviya. Lê belê bi wî girt û kincê wî rahişt. Pîreka Potîfar, bi gotina: “Dîlê te êrîşî min kir!” gilî kir; “Binêre, kincê wî li vê derê yî!” Potîfar hêrs bû! Dibe ku dizanîbû pîreka wî derewan dike. Lê belê divê tiştekî bikira. Gelo dê çi bikira?

Potîfar Ûsiv xiste girtîgehê. Çawa ku bêguneh bû lê dîsa jî Ûsiv ne di nava janê de û bihêrs bû. Di nava tengasiyên xwe de fêr

dibû ku, her li ku derê be, bila be – di girtîgehê de be jî –, ger rêzdariyê li Xwedê bike, dê Xwedê jî wî xîretdar bike.



**Lawê Tête Hezkirin Dibe Dîlek**

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

Afirandin 37 û 39

*"Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne."*

Zebûr 119:130

**Dawî**

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

---

Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin
û bi Xwedê re biaxifin!

Yûhena 3:16

---

| Ferhengok Bi Kurdî | Mini Sözlük Bi Tirkî | Mini Wörterbuch Bi Almanî |
|---|---|---|
| Aqûp | Yakup | Jakob |
| Esav | Esav | Esau |
| Ûsiv | Yusuf | Joseph |
| Dîl | Köle | Diener |
| Girtîgeh | Cezaevi | Gefängnis |

## Xwedê Ûsivê Dîl Xîretdar Dike

Ûsiv ji aliyê efendiyê xweyî kevin bi xeletî avêtibû girtîgehê. Di girtîgehê de Ûsiv îtaetker û alîkarperwer bû. Geranîndeyê girtîgehê bona ku jiyana girtîgehê bixe rêzê, bi Ûsiv re ewle bû. Ji ber ku Xwedê bi Ûsiv re bû, girtîgeh bona her kesî bû



cihekî hê jî qenc. Firnekarê Qiral û sermeygerê wî jî di girtîgehê de bûn.

Rojekê Ûsiv ji wan re pirsa: “Ma gelo hûn çima ev qasî xemgîn in?” pirsî. Bi gotina: “Tu kes nikare wateya xewnên me nîşanî me bidin” wî bersivandin. Ûsiv: “Hela xewnên xwe ji min re bibêjin.” “Wateya xewnê ev e; tuyê di nava sê rojî de vegere xizmeta Qiral Firawûn,” got Ûsiv ji sermeyger re. “Min di bîra



xwe de bîne û ji Firawûn berdana min bixwaze!" Xewna firnevan agahiya xerab anî. Ûsiv: "Tuyê di nava sê rojî de bimire!" got.

Her du xewn jî pêk hatin. Lê belê sermeyger Ûsiv jibîr kir, da ku heta rojekê Fîrawûn bi awayekî perîşanî hişyar bû. "Xewnekê dîtim" got. Tu mirovên wî yên zanyar nikarîbûn wateya xewnê ji wî re bigotana. Paşê sermeyger Ûsivê ku di girtîgehê de yî di bîra xwe de anî. Di derbarê wî de ji Fîrawûn re got. Fîrawûn hema da bangkirin ku Ûsiv were. Ûsiv ji Qiral re: "Xewna te ji Xwedê peyxamek e" got. "Dê li Misirê heft sal berdarî, paşê jî heft sal xelayek dijwar bibe." Û paşê jî Ûsiv bi gotina: "Niha bona heft salî plansaziya dahiştina zadê bikin" saloxê da Fîrawûn, "ya na dê gelê we di xelayê de ji birçîbûnê bimirin." Fîrawûn bi gotina: "Xwedê bi te re ye" vegot; "Li Misirê tuyê li pêy min bibe kesê herî rayedar e."

Heft salên berdariyê hatin. Paşê heft salên xelayê. Ji ber ku bi baqilî, bi zêdeyî dahiştinê kiribûn, ji bilî Misirê xwarin gellekî kêm bû. Li welatê Ûsiv yê li dûra yî, malbata Aqûp tunebûnê dikêşiyan. Ji hemî welatan, mirov bona ku genim bistînin çûn Misirê. Aqûp bi gotina: "Divê hûn jî biçin" destûrê da lawên xwe, "ya na em ê ji birçîbûnê bimirin!"

Dema gehîştin Misirê, zarokan bona ku xwarinê bistînin amadekariyê kirin. Lawên Aqûp li ber kesê ku girîng e û di rêwebiriya Misirê de yî bejnên xwe tewandin. Birayên wî Ûsiv nas nekirin. Lê belê Ûsiv wan nas kirin. Xewnên Ûsiv yên zarokantiya wî hatin bîra wî. Xwedê wî li ber birayên wî bilindtir kiribû. Ûsiv gellekî baqil bû. Bi tundî axifî û birayê xwe Şîmûn bi desteberî girt. Û bi gotina: "Zewêde rahêjin, herin malê û tevî birayên xweyî herî ciwan vegerin vir!" emir li wan kir. "Bi vî awayî ez ê fam bikim ka hûn sixûr in an ne sixûr in."



Birayan fikirîn; ji ber ku, berî gellekî salan birayê xwe Ûsiv firotine Xwedê wan bi ceza dike. Hişê Aqûp û lawên wî li hev ketibûn. “Pereyê me di nava genim de şunda hatiye û rêwebir xwest ku em Benyamîn jê re bibin.” Dê Aqûp destûrê nedaya ku Benyamîn biçe. Lê belê piştî demeke kurt zewêdeyên wan qediyan. Birayan dîsa hewcedar man ku vegerin Misirê. Benyamîn jî bi wan re çû. Dema Ûsiv Benyamîn dît, destûrê da

xizmetkarên xwe ku bila ziyafeteke mezin amade bikin. Birayan vexwandî bûn. Ûsiv bi gotina: “Gelo bavê we li jiyanê ye û qenc e?” pirsî. Dibe ku difikirî ka dê hemiya malbatê çawa bîne ba hev.

Û ji aliyê din jî Ûsiv dixwest fam bike ku ka gelo birayên wî ji ber gunehê ku beriya gellekî salan e kirine poşman in an nînin. Piştî ziyafetê wan bi diziyê tawanbar kirin: “Ez bona ku we bi ceza bikim, Benyamîn bi dîlitî bigirim” got Ûsiv. Cihûda



bi gotina: “Mîrê min, di dêvila wî jiyana min bistîne!” lava ji wî re kir. Ûsiv fam kir ku Cihûdayê beriya salan firotina Ûsiv pêşniyar kiriye bi rastî jî guheriye. Êdî nikarîbû hezkirina xwe ya ji malbata xwe re, zêde veşêre.

Ûsiv hemî Misiriyan derxistin derve. Paşê dest bi giriyê kir: “Ez birayê we Ûsiv, yên ku we wî firotine Misirê me!” Birayên wî bi tirs û matmayî tu tiştekî jî negotin. Ûsiv birayên xwe teşwîq



kirin. “Xwedê min li Misirê kir rêwebir, bi vî awayî di vê xelayê de hêz anîm ku jiyanan biparêzim. Herin û bavê min bînin. Ez ê we xwedî bikim.”

Aqûp û Ûsiv li Misirê dîsa digel hev bûn û hemî malbat li wê di nava firehî û aştiyê de jiyana xwe domandin.

**Xwedê Ûsivê Dîl Xîretdar Dike**

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

Afirandin Beşên ji 39’an heta 45’an

*“Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne.”*

Zebûr 119:130

**Dawî**

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin
û bi Xwedê re biaxifin!

Yûhena 3:16

| Ferhengok Bi Kurdî | Mini Sözlük Bi Tirkî | Mini Wörterbuch Bi Almanî |
| --- | --- | --- |
| Xewn | Rüya | Traum |
| Sermeyger | Başsakî | Mundschenk |
| Firnevan | Fırıncı | Bäcker |
| Berdar | Bereket | Segen |
| Pere | Para | Geld |

## Dotmîrê Ku Ji Çem ve Hatiye

Serokwezîr Ûsiv çûbû ser heqiya xwe (miribû)! Hemiya Misirê xemgîniya malbata wî par ve kirin. Xwedê Ûsivê Îbranî bona ku welêt ji xelayê biparêze bikar anîbû. Ew pêşawayek biaqil û tête jê hezkirin bû.

Qandî sê sed salî dem buhurî bû. Gelê Ûsiv, Îbraniyan, li Misirê bûbûn nîjadeke mezin. Fîrawûnê nû ji ber tirsa ku, Îbranî li dijî wî bin, gellekî ditirsiya, ji ber vê yekê wan hemiyan kirin dîl. Firawûn bi xedarî li Îbraniyan kirin. Bona ku bajarên mezin ava bikin, tahde li wan kirin. Lê belê wan her çi qasî bixebitînin jî, dîlên Îbranî bi hejmarî hê jî zêde bûn.

Rojekê ji Fîrawûn emirek tirsehêz hate: "Hemî zarokên nêr yên nû bûyîne, divê bi Çemê Nîlê ve bêne avêtin." Fîrawûnê xerab, armanca kêmkirina hejmara Îbraniyan dabû pêş xwe. Heta dê pitikan jî bikuştana!

Dibe ku malbat bi gotina: "Ka em dikarin çi bikin?" fikirî bin. Biryarê dan ku zarok bixin Çemê Nîlê. Lê belê dê di nava zembîleke rehet û germ û avê nagire de bûba. Bi barê xwe yê ku bi rûmet e, zembîl-bot a biçûk di nava qamiran de herikî. Gelo dê aqûbeta pitikê biçûk çawa bibûya?

Ji dûr ve xûşka pitikê, di nava qamiran de, zembîla birûmet ya bi hejînê bi awayekî nazik diherike temaşe kir.

Di wê navberê de qîza Fîrawûn û xizmetkarên wê bona xweşuştinê hatin ber çem. Bona veşartina zembîlê tu rê tunebû. Dibe ku zembîlê nedîtina û derbas bibûna û biçûna. "Ha! Zembîlek! Li wê, di nava qamiran de. Gelo çi di hundirê wê de

heye?” Qîza Fîrawûn ji xizmetkara xwe xwest ku zembîlê bîne. Dema zembîlê vekir – pitik dest bi girî kir. “Ev pitikek Îbranî ye,” got keçmîr. “Rebenê tiştê biçûk. Tu pirr xweşik î.” Dibe ku qîza Fîrawûn mîna gellekên gehîştî diaxifin bi pitikê re axifî be. Dibe ku: “Ootchîe-kootchîe Koo-ums” gotibe – bi xwezayî di zimanê Misirê de.



Wisa xuya dike ku Xwedê zanyariyek taybet dabe xûşka pitikê. Banz da çû cem qîza Fîrawûn û jê re: "Gelo tu dixwazî ez bona ji bo te li pitikê binêrî jinikek Îbranî bibînim?" got. Bi gotina "bidomîne" qîza Fîrawûn wê bersivand.

Gelo qîzik bona ku here bîne çû cem kê?

"Dayê! Bilezîne were! Haydê, lez bike!" Dibe ku bona daxuyaniyê wextê wê nebûbe. Pev re ji pêlengê ber ve jêrê ve banz dan. Dema hatin cem çem, qîza Fîrawûn gede di dest de sekinîbû. "Bo min wî xwedî bike! Ez ê berdêla wê bidime te. Ji wî re bêje Mûsa." Dibe ku di zimanê Misirê de wateya Mûsa, lawê (ji) avê be.

Bi vî awayî Mûsa vegeriya mala dê û bavê xwe. Ji Xwedê û ji gelê Îbranî hezkirinê fêrî wî kirin. Piştî demeke kurt dê bi qîza Fîrawûn re bijiya. Planek nûwaze ya Xwedayê ku wî xelas kiriye, bona Mûsa hebû.

**Dotmîrê Ku Ji Çem ve Hatiye**

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

Ji Misirê Derketin 1-2

*"Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne."*

Zebûr 119:130

**Dawî**

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya

gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

---

**Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin
û bi Xwedê re biaxifin!**

Yûhena 3:16

---

| Ferhengok Bi Kurdî | Mini Sözlük Bi Tirkî | Mini Wörterbuch Bi Almanî |
|---|---|---|
| Mûsa | Musa | Mose |
| Fîrawûn | Firavun | Pharao |
| Çemê Nîlê | Nil Nehri | Fluss Nil |
| Zembil | Sepet | Kästchen |
| Dotmîr | Prens | Prinz |
| Qîz | Kız | Tochter |

## Dotmîrek Dibe Şivan

Rojekê Mûsa dît ku yekî Misirî, dîlek Îbranî dikute. Çawa ku Mûsa li qesra Fîrawûn wekî dotmîrek mezin bûbe û perwerdê stendibe jî, ew bi xwe Îbraniyek bû. Divê alîkariyê bi yê dîl re bikira. Li dora xwe nihêrt û dema fam kir ku kes wî nabîne, êrîşî efendiyê dîl kir. Di şer de Mûsa yê Misirî kuşt. Hema bi lezî laşê wî sparte axê.



Dotira rojê, Mûsa dît ku du kesê Îbranî şer dikin. Xwest ku wan aş bike. Yekî: “Ma gelo mîna ku te yê Misirî kuşt, tuyê min jî bukujî?” got. Mûsa tirsiyabû.

Her kes bi tiştên ku roja berê bûne û qewimîne dizanîbûn. Fîrawûn jî bihîst. Pêdivî hebû ku Mûsa bireviya. Çû welatê ku navê wê Midyan e. Dema Mûsa li ber bîrê rawestî bû heft qîzên Kahînê Midyanî, bona keriyê bavên xwe delavan bi avê dagirtin. Şivanên din xwestin ku wan biqewirînîn. Mûsa jinikan parastin û alîkariyê bi wan re kir. Bavê qîzan Reûyel bi gotina: “Way hûn zû li malê ne” qêriya. Dema qîzikan sedema hatina xwe gotin, bavê wan: “Zilam bînin vê derê!” got.

Mûsa bi Reûyelê jê re Yetro jî tête gotin re jiyana xwe domand. Paşê Mûsa bi qîza Reûyel ya mezin re axifî.

Fîrawûn li Misirê mir. Gelê Xwedê Îbraniyan hê dîl bûn. Di nava jan û kulan de çawa dinaliyan! Bona ku Xwedê alîkariyê bi wan re bike çi qasî dua kirin! Xwedê duaya wan bihîst. Birastî Mûsa nizanîbû lê Xwedê bona ku Îbraniyan ji dîlitiyê ve xelas bike, plansaziya bikar anîna wî kiribû.

Piştî cudabûna Mûsa ya ji Misirê çel sal buhurî bû. Şivanê keriyê Reûyel bû. Lê belê divê bêriya gelê xwe yên ku li Misirê ne kiribe. Rojekê Mûsa hay jê çêbû ku deviyek li dor wî ye dişewite. Lê belê agir deviyê neqedand. Mûsa xwest ku hîn bibe ka çi dibe û diqede.

Dema Mûsa nêzîk çû, Xwedê ji nava deviyan bangî wî kir: “Mûsa!” Mûsa got: “Li vê me.” Xwedê got: “Zêde nêz neyê, çaroxên xwe ji pêy bike, ji ber ku axa tu pê lê dikî, axa pîroz e.” Xwedê: “Bona ku ez gelê xwe ji Misirê derxînim, ez ê te bişînim cem Fîrawûn” got.



Lê belê Mûsa ji çûyînê ve ditirsiya. Paşê Xwedê hêza xwe ya mezin nîşanî Mûsa da. Çoyê Mûsa wergerand marekî. Dema Mûsa ji terîka mar girt, dîsa bû ço. Xwedê amajeyek din da. Bi gotina: “Destê xwe têxe paşila xwe!” Xwedê destûrê da. Mûsa wisa kir. Destê wî ji cizamê fitilî sipî bû. Dema dîsa vê yekê kir, destê wî qenc bûbû.

Mûsa dîsa îtiraz kir: “Ez nikarim qenc biaxifim” got ji Xwedê re. Xwedê hêrs bû. “Bona gotinê ku tuyê ji wî re bibêjî, ez ê birayê te Harûn bikar bînim” got Xwedê.

Mûsa vegeriya cem Yetro, alavên xwe dane hev û bona ku biçe Misirê cuda bû. Xwedê wisa pêk anî ku birayê Mûsa, li çiyayan pergîniyê li Mûsa kir. Mûsa ji Harûn re hemî planên Xwedê yên di derbarê Îbraniyan ji Misirê ve xelas bikin de, got. Pev re vê agahiyê birin serekên Îbraniyan.

Dema Mûsa amajeyan nîşanî pêşhatiyên Îbraniyan kirin, wan jî fam kirin ku dê Xwedê alîkariyê bi wan re bike, pev re peristinê ji Xwedê re kirin.

Mûsa û Harûn bi awayekî dilawêrî çûn cem Fîrawûn. Ji Fîrawûn re: “Xwedê dibêje ku; ‘Berde, bila gelê min herin,’” gotin. Lê Fîrawûn: “Ez destûrê nadim ku bila Îsraêlî biçin,” got. Dê ji Xwedê re îtaetê nekira. Bona ku Xwedê ramana Fîrawûn biguhere, divê hêza xwe ya mezin bi kar bianiya.

**Dotmîrek Dibe Şivan**

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

Ji Misirê Derketin Beşên ji 2’an heta 5’an

*“Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne.”*

Zebûr 119:130

**Dawî**

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê

dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

---

Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin
û bi Xwedê re biaxifin!

Yûhena 3:16

---

| Ferhengok Bi Kurdî | Mini Sözlük Bi Tirkî | Mini Wörterbuch Bi Almanî |
|---|---|---|
| Îbranî | İbrani | Hebräer |
| Bav | Baba | Vater |
| Devî | Çalı | Dornbusch |
| Çarox | Çarık | Sandale |

## Oxir Be Fîrawûn!

Fîrawûn bir hêrs bû!

Xwedê bi navgîniya Mûsa emir dabû wî ku bila destûra çûyîna dîlên Îsraêlî ya ji Misirê bide. Vê yekê red kir. Firawûn bi gotina: "Wan hê jî zêdetir bixebitînin!" emir da hostayên dîlan.

Niha bona Îsraêliyan her tişt hê jî xerabtir bûbûn. "Hûn bona xwe ka bidine hev. Em ê êdî wê nedin we. Lê belê divê hûn di heman hejmarê de tuxleyan çêbikin." Vana destûrên Fîrawûn yên nû bûn. Suxrevanan hinekî dîlan kutandin, ji ber ku bona têra xwe çêkirina tuxleyan dema wan çênebûbûn.

Mirovan ji ber pirsgirêkên xwe tawanbariyê li Mûsa û Harûn kirin. Mûsa bona duakirinê cihekî ji xwe re dît. Bi gotina: "Ya Xudan" bang kir, "Tu gelê xwe qet xelas nakî."

Xwedê bi gotina: "Ez Xwedê me û ez ê we derxînim derve" wî bersivand. Paşê Xwedê Mûsa û Harûn dîsa şandin cem Fîrawûn. Dema Serwerê şiyandar, ji xizmetkarên Xwedê ve xwest ku, ji Xwedê elametekê nîşan bidin: Çoyê Harûn werge-riya marekî şematok. Fîrawûn bi gotina: "Bangî sêrbazên min bikin" qêriya.

Dema sêrbazên Misirî çoyên xwe avêtin erdê, her çoyek bû marek. Lê belê çoyê Harûn yên din dabelihandin. Fîrawûn dîsa jî bona çûyîna gel destûrê neda.

Dotira rojê, Mûsa û Harûn li ber çem hatin cem Fîrawûn. Dema Harûn ço dirêj kir, Xwedê avê wergerand, kir xwîn. Masî mirin! Mirovan hêz neanîn ku wê vexwin! Lê belê Fîrawûn dilê

xwe tund kir. Dê rê nedaya ku Îsraêlî Misirê biterikînin. Mûsa dîsa ji Fîrawûn re got ku bila destûrê bide çûyîna gelê Xwedê. Fîrawûn dîsa wî red kir. Xwedê asîweke din şand. Her aliyê Misirê bi beqan ve tijî bûbûn. Her xanî, her menzel heta firneyên kelandinê jî bi beqan ve tijî bûbûn! Fîrawûn bi gotina: “Bona min dua bikin ku bila Xwedê beqan bi dûr ve bixîne.” “Û ez ê bona çûyîna gelê we destûrê bidim.”

Lê belê dema beq çûn, Fîrawûn dîsa ramanên xwe guhertin. Dê azadiya wan nedana dîlan. Paşê Xwedê bi milyaran kêzikên biçûk yên ji wan re kermêş jî têne gotin şandin. Hemî mirovan û ajalan ji ber devlêkirina wan dest bi xurê kirin, lê belê dê Fîrawûn radestî Xwedê nebûya. Paşê Xwedê bi keriyan qirniyan şandin.

Xwedê, bona ku ajalên Misiriyan bikujin, nexweşiyan şandin. Xwedê kînorên êşê dide bi ser wan ve şandin.

Mirovan gellekî êş û janan kêşandin. Fîrawûn hê jî li ber Xwedê bi rik bû. Piştî asîwa kînorê, Xwedê artêşên kuliyan şandin. Kuliyan li welat her tiştên hêşîn xwarin. Paşê Xwedê sê roj reşetariyê şand. Lê belê dê Fîrawûnê bi rik Îsraêliyan bernedana.

Xwedê bi gotina: “Ez ê asîwek dawîn bişînim” wan da hişyar kirin. “Nîvê şevê, dê hemî pêşî bûyiyên mirov û ajalan bimirin.”

Xwedê ji Îsraêliyan re, ger xwîna berxikê di şêmûga deriyên xwe de bidin, dê zarokên xwe yên pêşiyê bûyîne bikaribin xelas bikin, got.

Nîvê şevê li Misirê qêrînek mezin hate bihîstin. Mirin li Misirê xistibû. Ji her malê herî kêm kesek miribû.

Fîrawûn bi gotina: “Herin!” lava ji Mûsa re kir. “Herin û qûlitiyê ji Xwedê re bikin.”

Gelê Xwedê bi lezî meşiyan ji tixûbên Misirê wêdetirê. Xwedê ji Mûsa re, bi bîrve anîna Şeva Fisihê got, ji ber ku milyaketê Xwedê ji ser malên Îsraêliyan derbas bûbû û li Fîrawûn û li gelê wî xistibûn.



Piştî 430 salên ku li Misirê buhurîne, êdî gelê Xwedê azad bûn. Xwedê bi rojê di xuyabûna sitûnê ewrê de û bi şevê jî di xuyabûna sitûna êgir de rê nîşanî wan da.

Lê belê karê Fîrawûn bi Îsraêliyan re neqediyabû. Dîsa Xwedê ji bîr kir. Dîsa ramanê xwe guhert. Artêşa xwe hewand û li pê dîlan ket.

Piştî demeke kurt wan di nava kendal û behrê de xistin dafikê. “Dê XUDAN bona we cengê bike” got Mûsa.

Mûsa çû qeraxa avê û destê xwe dirêj kir. Paşê mûcîzetek mezin bû, Xwedê ji nava avan rêyekê vekir. Gel di nava ewlekariyê de derbas bûn.

Paşê artêşa Fîrawûn bi çargavî banz dan Çemê gewez. Leşkerên wî mîna: “Niha em ê wan bigirin” fikirîn.

Lê belê Xwedê avan wergerandin. Artêşa Misirê ya xurt ji aliyê avan ve hate daqurtandin.

Niha Fîrawûn dizanîbû ku Xwedayê Îsraêlê, Xudanê li her derê ye.

**Oxir Be Fîrawûn!**

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

Ji Misirê Derketin 4-15

*“Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne.”*

Zebûr 119:130



**Dawî**

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike,

Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

---

**Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin**
**û bi Xwedê re biaxifin!**

Yûhena 3:16

---

| **Ferhengok Bi Kurdî** | **Mini Sözlük Bi Tirkî** | **Mini Wörterbuch Bi Almanî** |
|---|---|---|
| Tuxle | Tuğla | Ziegel |
| Asîw | Bela | Plage |
| Xwîn | Kan | Blut |
| Beq | Kurbağa | Frosch |
| Kermêş | Sivrisinek | Fliege |
| Kînor | Çıban | Eiterbeule |
| Çemêgewez | Kızıldeniz | Rotes Meer |

## Çel Sal



Dema Xwedê Îsraêliyan ji Misirê ve derxistin, Mûsa bona peristinê bikin telqînê li mirovan kirin. Qesîdeyek spasiyê nivîsand. “Ez ê murxan pêşkêşî Xudan bikim, ji ber, her ku bilind

bû, bilindtir bû." Mûsa bona hemû karên pîroz, yên ku Xwedê bona Îsraêlê kirine qesîdeyê got.

Li çolê piştî sê rojî mirovên ku tî bûne kamavê dîtin. Lê belê nikarîbûn ava tahl vexwarana. Lê li dêvila duakirinê mirovan gilî û gazincan kirin. Xwedê gellekî nazik bû, avê bona vexwarina wan guhert û kir ava vexwarinê.



Wisa bûbû ku wekî mirovan ji ber her tiştî gilî dikin. Bi gotina: “Li Misirê xwarina me hebû. Li çolê em ê ji birçîbûnê bimirin” gazincan kirin. Wê êvarê Xwedê civîkên bi navê Sûsik têne binav kirin şandin. Mirovan bi hêsanî wan digirtin. Dotira rojê Xwedê man şand. Man cûreyek nanê ku mîna biskuvîtê tenik û bi hungiv e, bû. Her sibe man li erdê bona berhevkirinê amade bû.

Bi vî awayî Xwedê li çolê, gelê xwe têr kir.

Bona her roj xwarina nû divê bi Xwedê ve ewle bibûna. Lê belê hinekên ji wan, çawa ku Xwedê gotibû dê di şevekê de xera bibe, lê dîsa jî bi zêdeyî manê dane hev. Bi rastî jî dotira rojê, kurm ketibû mana roja berê.

Ji bilî Roja Şabatê. Di wê roja heftemîn ya taybet de mirovan rawestiyan û mana rojekê berê xwarin.

Xwedê li çolê çavdêriyê li Îsraêliyan kir. Nan û avê dan wan û wan ji neyarên wan ve parastin. Dema Amalêkiyan êrîş kirin, Îsraêl, heta ku Mûsa çoyê Xwedê ber ve jor hilda, serfirazbûyînê domand.

Xwedê ji Îsraêliyan re: “Ger hûn bi dengên min ve îtaet bikin, hûn ê bibin gelê min yên taybet” got.

Gel ji Mûsa re: “Em ê her gotinên Xwedê bînin cih” gotin. Hatin quntara çiyayê Sînayê û dema Mûsa çû hevdîtina Xwedê, sekinîn, li bendê man. Mûsa di tûmiya çel rojî de, li çiyê, bi Xwedê re bû. Xwedê li ser du lewhayên ji kevir in Deh Emirî nivîsandin. Ji Mûsa re, ka dixwazî gelê Wî çawa bijîn got.



1. “Dê ji bilî min xwedayê te nebe.”
2. “Tuyê seneman çê neke û li ber seneman xwar nebe.”
3. “Bela sedem navê XUDAN negire devê xwe (nebêje).”
4. “Roja Şabatê bi pîrozî di bîra xwe de bîne.”
5. “Hurmetê ji dê û bavê xwe re bike.”
6. “Tuyê nekuje.”
7. “Tuyê zinê meke.”
8. “Tuyê nedize.”
9. “Tuyê çav bernede.”
10. “Tuyê derew nebêje.”

Gava Mûsa li Çiyayê Sînayê, ligel Xwedê bû, Îsraêliyan tiştekî gellekî xerab e kirin. Xwestin ku Harûn golikek zêrînî çêbike – û heta ku peristinê ji Xwedê re bikin, bi wî golikî ve peristinê kirin. Xwedê gellekî hêrs bûbû. Mûsa jî. Dema Mûsa golikê û mirovên ku direqisin dîtin, lewhayên kevirîn li erdê parî parî

kirin. Bi hêrsê Mûsa pûtê zêrînî tune kir. Mirovên xerab ên ku bi wê peristine tune kirin. Xwedê her du lewhayên kevirîn dîsa da. Ji Mûsa re got ku bila xaniyekê ava bike – Çadirek mezin ya li dora wê çît heye – cihekî ku Xwedê digel gelê xwe li wê bijî. Dê li wê peristinê ji Xwedê re bikirana.

Sitûna ewr û êgir xuya da ku Xwedê bi wan re ye. Dema nêzîkî Kenanê bûn, Mûsa, bona welatê ku Xwedê ji gelê xwe re waad



kiriye bibînin donzdeh sixûr şandin. Hemî sixûran di derbarê xweşikayiya welêt de yek raman bûn! Lê belê tenê ji wan du kes, Yêşû û Kaleb bawer kiribûn ku dê bi alîkariya Xwedê welêt bi dest ve bixin.

Deh sixûrên din ji bajarên xwurt û dêwên li welêt in ditirsiyan. Bi gotina, “em nikarin welêt bi dest ve bixin” naliyan. Karên mezin yên ku Xwedê bona ku wan ji Misirê derxînin kirine



jibîr kirin. Gel deh sixûrên ku bawer nakin şopandin. Giriyan û bona şunda vegerin Misirê amadekariyê kirin. Heta kuştina Mûsa jî xwestin!

Xwedê jiyana Mûsa parast. Paşê ji gel re: “Hûn ê di tûmiya çel salî de li çolê bigerin. Tenê Kaleb, Yêşû û zarokên we dê bona bikevin welatê ku we biçûk dîtine bijîn” got.

## Çel Sal

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

Ji Misirê Derketin 15’an heta Li Çolê Jimartin 14’ê

*“Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne.”*

Zebûr 119:130

## Dawî

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin
û bi Xwedê re biaxifin!

Yûhena 3:16

| Ferhengok Bi Kurdî | Mini Sözlük Bi Tirkî | Mini Wörterbuch Bi Almanî |
|---|---|---|
| Deh Emir | On Emir | Zehn Gebote |
| Murx | Ezgi | Lied |
| Çol | Çöl | Wüste |
| Gazinc | Yakınma | Klage |
| Sûsik | Bıldırcın | Wachtel |
| Çiya | Dağ | Berg |
| Senem | Put | Götze |

## Rût: Çîrokek Evîniyê

Ger we bapîr û dapîrên xwe yên mezin û dapîr û bapîrên wan û hemî kesên malbata xwe yên berî we hatine binasiyan, hûn ê di derbarê, ka mirovên çawanin de şaş û metal bimana.

Di Kitêba Pîroz de, yek ji dapîrên mirovî yên Îsa jî Rût bû – Jineke Moabî ya bi seneman re peristiye bû.

Çîroka Rût, paşî demên Şîmşon yên gelê Xwedê, ji Xwedê ewlebûn û îtaetkirinê berdane, li Îsraêlê dest pêdike.

Xelayek dijwar li welêt xistibû. Gelo hûn dizanin xela çiye? Rast e! Xela, dema fêkî an jî zad çênabe û ajalan, heta carînan mirovan jî ji birçînê dimirin e.

Zilamek, Êlîmelek, tevî jina xwe û du lawên xwe, bona ku zewade bibînin, Beytlehemê terikandin. Çûn Moabê, welatekî ku mirovan ji seneman re peristinê dikin. Li Moabê rewş bona Êlîmelek û malbata wî ne qenc bû. Mîna her du lawên xwe ew jî mir.

Pîreka wî Naomî, tevi her du jinên lawên xwe, bi Rût û Orpa re li şunda mabû. Her du jinik jî ji Moabê bûn. Niha Naomî jine-biyek wisa bû ku, bihîstibû Xudan serîdana Gelê xwe kiriye û nan daye wan. Biryar da ku vegere welatê xwe. Lê belê ka dê her du jinikên din çi bikira? Naomî pêşniyarê dane wan ku bila li Moabê bimînin û dîsa bizewicin.

Orpa vegeriya cem malbata xwe, lê belê Rût vê yekê kirinê red kir. Li dêvila vêya Rût helbestekê ku di derbarê dê tu carî dev ji xwesiya xwe bernede sozê dide, yî xwend.

Hevalbendên Naomî yên kevin, bi vegera wê ya Beytlehemê kêfxweş bûn. Lê belê wê ji wan xwest ku ji wê re li dêvila Naomî (şêrîn), bi navê "Mara" (tahl) bibêjin. "Ji ber ku Xwedayê hêza Wî têra her tiştî dike, gellek tahliyê da min." Naomî, ji bilî Rût, tu tiştekî wê tunebû, vegeriya.

Çawa ku Rût mîna gellek mirovên li Moabê ne peristinê ji seneman re kiribû, ji seneman peristinê vegeriya û peristinê ji



Xwedayê Îsraêlê yê Zindî re kir. Rût heta ku têra xwe zewêde ji Naomî re da hev, gellekî xebitî. Her roj yên ku di nava zeviyan de xebitîne şopandin û zadê ku li şunda mayîne da hev.

Boazê xwediyê zeviyê, bihîst ku Rût çawa bi qencî hurmetê nîşanî xwesiya xwe dike. Dema bi wê re hevnasînê kirin, Boaz ji oraqvanên xwe xwest ku bona alîkariyê bi wê re bike, li şunda bi zêdetir zad bihêlin. Boaz dest pêkiribû, ji Rûtê hez dikir.

Dema Rût ji Naomî re Boaz û qenciya wî got, jinika pîr Xwedê bilindtir kir. "Ew zilama ji merivên me, merivên nêzîkî me ne."

Dem buhurî, Boaz xwest ku bi Rût re bizewice û li Naomî û zeviyên malbata wê ve xwedî derkeve. Lê belê pêşiyê dor li merivekî din yê nêzîkî wan de bû. Vî zilamî xwest ku zeviyan rahêje, lê belê Rût bi jinitî nexwest. Zagon digot ku heta yek nebe, li ya din xwedî derketin nabe.

Di wan rojan de mirovan bona di nava hev de peymanê çêbikin destê hev nedigirtin. Boaz li ber mirovên din çaroxa xwe derxist û da zilamê din. Peymana kar hatibû çêkirin. Rût êdî dikarîbû bibûya pîreka wî.

Niha ew û Naomî bûn endamên malbata Boaz. Boaz û Rût navê Obêd dane lawên xwe yê yekemîn. Obêd bû bapîrê mezin yê Dawidê Qiralê Mezin yê Îsraêlê yî.

Lê belê ya ji vêya nûwazetir, Obêdê pitik bapîrê Xudan Îsa Mesîh bû. Bona ku Îsa bibe Qiralê Qiralan û Xelaskerê dinê, ji darê nifşeya Dawid ve hate.

**Rût: Çîrokek Evîniyê**

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

RÛT

*“Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne.”*

Zebûr 119:130

**Dawî**

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

---

**Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin**
**û bi Xwedê re biaxifin!**

Yûhena 3:16

---

| **Ferhengok Bi Kurdî** | **Mini Sözlük Bi Tirkî** | **Mini Wörterbuch Bi Almanî** |
| --- | --- | --- |
| Beytlehem | Beytlehem | Bethlehem |
| Xela | Kıtlık | Hungersnot |
| Zevî | Tarla | Feld |

## Dawidê Şivanê Zarok

Beriya gellek salan, di rojên Saûlê Qiralê Îsraêlê de, lawikek bi navê Dawid, bona ku li keriyên bavê xwe binêre alîkariyê bi heft birayên xwe re dikir. Çawa ku herî ciwanên wan bû, lê dîsa jî Dawid zarokek xwurt û dilawêr yê ji Xwedê hez dike û pê ewle dibe bû. Li navçeya Beytlehemê dijiya.

Demekê şêrek, bona berxikek biçûk wekî şîvê biqefêle êrîşî keriyê kir. Dawidê ciwan êrişî êrişkar kir. Berxikê kêşa dûra û ajala ku ketiyê dafikê ji rîha wî ve girt û wî kuşt. Dawid pê zanîbû ku Xwedê alîkariyê bi wî re kiriye.

Samûyêl, peyxamberê Xwedê, hê ji ber binketina Qiral Saûl ya li dijî Xwedê bi awayekî xerab binketiye xemgîn bû. Xwedê bi gotina: "Hê tuyê heta kengê bona Saûl xemgîn be?" bi Samûyêl ve xeyidî. "Ez te dişînim cem Îşay… Ji ber ku min ji lawên wî yekî, bi Qiraltiyê hilbijartiye."

Îşay bavê Dawid bû. Çawa ku Samûyêl dizanîbû, ji ber ku bona dîtina Qiralekî din diçe, dibe ku Qiral Saûl wî bukuje lê dîsa peyxamber li gor daxwaziya Xwedê kir.

Dema Samûyêl hate, Îşay her heft lawên xwe ji ber Samûyêl ve derbas kirin. Û Samûyêl ji Îşay re: Xwedê ji vana yekî jî hilnebijartine" got.

Wisa ku tenê Dawidê ku ji wan yê herî cîwan e mabû. Mîh li derve bûn, Dawid girtin hundir. Û XUDAN, "Rabe û wî mesh bike, ji ber yê ku bijartime ev e" got.

Li qesra Saûl, Ruhê Xudan ji Saûl ve cuda bû û Saûl bû kesekî gellekî dilteng. Xizmetkarên wî fikirîn ku dê muzîk aqilê Saûl aş bike. Ji wan yekî, zilamekî ku xweş li lîrê dixe nas dikir. Gelo hûn texmîn dikin, ka ew zilamê cîwan kî ye? Belê, Dawid e.



Muzîka Dawid, Saûl aş kir û bona rastramanê alîkariyê bi wî re kir. Saûl her kengi di bin bandora tirs an jî depresyonê de be, Dawid bona wî li lîrê dixist. Ev bû alîkar.

Paşî ku Dawid çû malê, Saûl bi Fîlistiyan re şerekî mezin kir. Birayên Dawid di artêşên Saûl de şer dikirin. Îşay bona ku xwarinê ji birayên xwe re bibe û saloxakê ji wan bîne Dawid şand eniya şer.

Golyatê ku dêwekî Fîlistî ye û gellekî gir e, hemî leşkerên Îsraêlê tirsandibûn. Bi gotina: "Ji nava xwe, yekî derkeve hemberî min hilbijêrin" qêriya Golyat. "Ger di şer de serkeftî bê û min bukuje, em ê bibin dîlên we. Na, lê ger ez wî bukujim, hûn ê bibin dîlên me û qûlitiyê ji me re bikin."

Hemiyên Îsraêlî dema yê dêw dîtin, ji wî reviyan… Bi tirsehêzekê mezin ditirsiyan. Paşê Dawid ji Saûl re: "Bila tu kes ji ber vî Fîlistiya bêzar nebe! Ez, qûlê te, ez ê herim û bi wî re cengê bikim" got. Saûl xwest ku Dawid zirxê li xwe bike û şûrekê bikêşe. Li dêvila vêya Dawid qewsikê xwe rahişt û ji ber çem jî pênc heb kevirên buxişk rahiştin.

Dema Golyat dît ku Dawidê ciwan zirx jî li xwe nekiriye, keniya. Bi gotina: "Ez ê laşê te bidim civîkên li ezmanê ne û ajalên li çolterê ne!" qêriya. Dawid bi gotina: "Ez bi navê XUDAN hatim ji te re!" bersivê da wî, "Îroj XUDAN dê te radestî destê min bike… Ji ber ku şer ji xwe ya XUDAN e!"

Paşê Dawid raste rast ber ve Golyat ve banz da. Dema banz dida bi qewsika xwe ve kevirekî avêt – tam li textika eniya Golyat. Golyat kete xwarê! Dawid hema şûrê Golyat yê gellekî mezin e rahişt û serê wî jêkir. Dema Fîlistiyan dîtin ku Golyat mir, bona ku jiyana xwe biparêzin reviyan.



Nehat bîra Qiral Saûl ku ev Dawidê wî bi lîrê ve aş dike yî. Dawid danî serê artêşa xwe – paşê gava gel Dawid birûmettir kirin, çavnebariyê li wî kir.

Saûl bi gotina: “Ma êdî ji bilî qiraletiyê çi kêmasiya wî maye ku?” fikirî. Bi vî awayî êdî Saûl çavdêriyê li Dawid dikir. Carekî din hişê Qiral Saûl li hev ketibû. Paşê Dawid, bona ku wî aş bike li muzîkê xist.

Saûl sê carî rimê xwe avêt Dawid. Lê belê her carî Dawid reviya. Saûl ji Dawid ditirsiya, ji ber dizanîbû ku XUDAN ji Saûl veqetiyayî lê bi Dawid re yî.

Lê belê Yonatanê lawê Saûl, bi biratî ji Dawid ve hez kir. Bi gotina: "Bavê min dixwaze ku te bukuje!" wî hişyar kir. Bi vî awayî Dawid reviya. Pîreka wî mankênek bêcan xiste nava livînên wî û nîvê şevê pê re alîkarî kir ku Dawid ji şivakê re reviya.

Dema sibehê zilamên Saûl hatin, Dawid çûbû. Dawid hewcedar ma ku ji Saûl ve gellekî bi dûr ve bireve. Beriya reva wî ew û Yonatan peymanekê çêkirin. Pev re soz dane hev ku dê her tim alîkariyê bi hev re bikin. Lê heyf û mixabîn ku her du heval pêdivî dîtin ji hev xatir bixwazin.

Dawid bona dîtina cihekî tirsa leşkerên Saûl wî bibîn lê tunebe geriya.

## Dawidê Şivanê Zarok

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

1.Samûyêl 16 -20

*"Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne."*

Zebûr 119:130

**Dawî**

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer

dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

---

**Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin**
**û bi Xwedê re biaxifin!**

Yûhena 3:16

---

| **Ferhengok Bi Kurdî** | **Mini Sözlük Bi Tirkî** | **Mini Wörterbuch Bi Almanî** |
|---|---|---|
| Lîr | Lir | Laute |
| Qewsik | Sapan | Schleuder |
| Kevir | Taş | Stein |
| Rim | Mızrak | Speer |
| Şûr | Kılıç | Schwert |
| Serî | Baş | Kopf |
| Peyman | Antlaşma | Bund |

## **Qiral Dawid** (Beşa 1)



Dawidê Ciwan direviya. Qiral Saûl xwest ku wî bukuje. Dawid li çolê, digel çar sed zilamê xwe di şikefteke mezin de jiyan.

Yek caran leşkerên Qiral Saûl hew diman ku wan bibînin. Lê belê Dawid her tim cih diguherand. Doegê xulamê Saûl ji Qiral re got ku kahînan bona reva Dawid alîkariyê pê re kirine. Saûl bona kuştina wan destûrê da. Lê belê tenê Doeg dixwest ku vê yekê bike.

Bi awayekî xwînxwarî heyştê û pênc kahînî û malbatên wan bi şûrê xwe ve kuştin. Gellekî bi zalimî bû.

Rojekê, Saûl dema hingavtina Dawid hewl dida û raste rast kete şikefta Dawid û zilamên wî tê de xwe vedişêrin. Saûl tenê bû! Di şikeftê de Dawid bixwesta, bi hêsanî dikarîbû Saûl bukuşta. Lê li dêvila kuştinê xwe ji erdê ve kêşa û hate nêzîka wî û vi xençera xwe ya tûj, ji dawa cuba wî, bi dizîka pariyekî jêkir.

Dema Saûl cuda bû Dawid bangî wî kir: "Min ji cuba te pariyekî jêkir, lê te nekuştim. Bizanibe ku di dilê min de xerabî û ramanê serîhildanê nîne…"

Saûl ji ber xwest ku Dawid biêşîne, kesirî. Lê belê paşî demek kurt dîsa hêrsa wî ya kevin şunda hat û bona ku Dawid bukuje, artêşek ji sê hezar kesî amade kirin. Şevekê, gavê leşker di xew de bûn Dawid û Abîşayê yek ji leşkerên wî ne ketin cihê kampê ya Saûl tê de radizê.

Abîşay bi gotina: "Îroj Xwedê neyarê te radestî te kir" pispisand. "Niha ji kerema xwe re destûrê bide ku ez bi rima xwe wî li erdê bikutim. Dê bona derba duwem pêdivî nemîne." Lê belê Dawid vê yekê red kir.

Dawid, rim û metera avê yên Saûl rahiştin û ji kampê cuda bû. Ji gira li hember e, Dawid, heta ku Saûl wî bibihîze bang kir.

Carekî din Saûl dît ku Dawid bixwaze dê bikaribe wî bukuje, lê nakuje. Carekî din Saûl ji ber ku xwestiye Dawid biêşîne xemgîniya xwe got. Lê belê Dawid dizanîbû ku bi Saûl ve bawerî nabe.

Di vê navberê de Samûyêl mir. Peyxamberê Xwedayê ku jê re gotibû ku bila pêşiyê Saûl paşê jî Dawid bi qiraletiyê mesh bike, bû.

Dema Filistiyan êrîşî Îsraêlê kirin, Saûl tiştekî xerab ya ku Xwedê kirina wê qedexe kiriye pêk anî. Ji jinikekê xwest ku ji warê miriyan bangî Samûyêl bike. Wê şevê Saûl mesajekê stend. "…XUDAN êdî te terikand û bû neyarê te… XUDAN Qiraletiyê ji destê te rahişt û da Dawidê hemnîjadê te ye. Sibê tu û lawên te hûn digel min bin. Dê XUDAN artêşa Îsraêlê ji radestî Filistiyan bike." Dema Saûl vana bihîstin, hema bi tirs kete xwarê.

Filistiyan li hemberî Îsraêlê şer kirin û gelê Îsraêlê reviyan. Filistiyan, tevî Yonatanê ku hevalekî qenc bû bona Dawid, hemî lawên Saûl kuştin.

Saûl ji aliyê tîrvanan ve bi birînek xedar birîndar bûbû. Ji çekkêşê xwe re: "Şûrê xwe bikêşe û di min de biçikîne, ya na dê zilamên xerab werin û şûrên xwe di min de biçikînin û qerfên xwe bi min re bikin."

Lê belê dê çekkêş vêya nekira, ji ber ku pirr ditirsiya. Bi vî awayî Saûl şûrekî rahişt û xwe bi ser de avêt. Filistiyên ku laşên Saûl û lawên wî dîtine, laşên wan bi dîwarê bajarê Îsraêlê ya ku bi dest ve xistine daliqandin (kutandin). Hinek Îsraêliyên dilawêr laşan xelas kirin, birin malê û şewitandin û yên ji ber mayîne li Îsraêlê spartin axê.

Dema Dawid agahiya xerab bihîst, şînê girt, giriya û heta êvarî bona Saûl, lawê wî Yonatan û bona gelê XUDAN rojiyê girt, ji ber ku wan dabûn ber şûran. Çawa ku Saûl xwestibû wî bukuje lê dîsa jî Dawid, ji ber ku Saûl kesê ku Xwedê wî mesh kiriye bû, heta dawiyê xîretdar kir. Niha jî Xwedê Dawid, li dêvila Saûl kir qiral û wî xîretdar kir.

## Qiral Dawid (Beşa 1)

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

1.Samûyêl 24 – 31; 2. Samûyêl 1 – 2

*"Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne."*

Zebûr 119:130

### Dawî

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

## Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin
## û bi Xwedê re biaxifin!

Yûhena 3:16

| Ferhengok Bi Kurdî | Mini Sözlük Bi Tirkî | Mini Wörterbuch Bi Almanî |
|---|---|---|
| Şikeft | Mağara | Höhle |
| Qiral | Kıral | König |
| Şîn | Yas | Trauer |

## **Qiral Dawid** (Beşa 2)

Dawid Qiralê Cihûda ya li başûrê Filistînê ye bû. Lê belê wekî din ên Îsraêlê di bin serweriya Qiral Îş-Boşetê lawê Saûl de bûn. Di tûmiya heft salî de şerê navîn bû. Lê belê Dawid hê jî xurt û xurt bû. Ya dawîn qiral Îş – Boşet ji aliyê du leşkerê xwe ve hate kuştin.

Paşê hemî eşîrên Îsraêlê hatin cem Dawid û wî mîna qiralê Îsraêlê be mesh kirin. Ya dawîn, Dawid bûbû qiralê hemî gelê Îsraêlê.

Karê pêşîn yê qiral Dawid kir, Orşelîmê bi destxistin bû. Bi navê Bajarê Dawid hate binav kirin. Li dijî neyaran kelehan lêkir û bajar dîsa avakir.

Artêşa Dawid, bona Filistiyan û neyarên din ên Îsraêlê bindest bikin ji Orşelîmê çû. Paşê, Qiral Dawid Sindoqa Xwedê anî Orşelîmê. Di Sindoqa Xwedê de Deh Emirên ku Xwedê dabûn Mûsa û zagonên din hebûn.

Sindoq pîroziya Xwedê û pêdiviya wan ya bona ku ji Wî re îta-etkirinê anî bîra Îsraêliyan. Dawid di salên qiraletiya xwe yên pêşîn de bona şerkirina gellek şerî hewcedar ma. Leşkerek biaqil û mirovek dilnizm yê bona ku Xwedê rê nîşanî wî bide dua dike bû. Çawa ku Sindoqa Xwedê di çadirê de dima lê Dawid bi xwe li maleke xweşik dima, ev yek wî aciz kir. Dawid bona avakirina perestgehekê biryar da.

Natanê peyxamberê Xwedê, jê re got ku bila bidomîne. Wê şevê Xwedê mesajek ji Dawid re şand: “Qûlê min Dawid, dê XUDAN malekê ji te re ava bike. Dema rojên te temam bibin û



tu bigihêjî bapîrên xwe, ez ê li pêy te lawê te bikim qiral. Yê ku dê li ser navê min xanî ava bike ew e û ez ê texta qiraletiya wî, heta bêdawîbûnê bidomînim."

Dawid xwest ku alîkariyê ji bermayiyên malbata Saûl re bike. Tenê lawê Yonatanê kud, Mefîboşet dît. Dawid got: "Dê mîna yek ji lawên qiral be ji sifra min xwarinê bixwe." Dawid, ji ber ku hevalê Yonatan yê qenc bû, bi qencî ji Mefîboşet re kir.

Heta ku Dawid bi Xwedê re ewle dibû û bi Wî re îtaetê dikir, Xwedê bona serfiraziya Dawid alîkariyê bi wî re dikir.

Lê belê rojekê siyek tirsehêz ket ser jiyana Dawid. Artêşa xwe şand cengê û ew li Orşelîmê ma. Şevekê xewa wî nedihat. Dest pê kir û li ser xanî meşiya û li bajêr nihêrt. Dawid dît ku jinikek xweşik serê xwe dişo. Navê jinikê Bat-Şeba bû. Zilamê wê Ûriya şervaneke Dawid yê dilawêr bû, lê dîsa jî Dawid bi Bat-Şeba re gunehê kir.

Dema Bat-Şeba ji Dawid re got ku dê ji Dawid pitikeke wê çêbibe, Dawid fam kir ku gunehê wî bi zêdetir pirsgirêkan derdixîne.

Dawid çawa ku divê gunehê xwe ji Xwedê re mukir were, lê wî dest pê kir û hewl da ku gunehê xwe binixumîne. Ma ev tu carî dibe? Bi hêviya Ûriya bibêje pitik ji min e, Ûriya ji eniyê bangî mala wî kir. Lê belê Ûriya, gava hevalên wî yên leşker di şer de bin, tu carî venegeriya malê.

Ûriya li ber deriyê mala qiral veket. Bi vî awayî Dawid xera-biyeke din kir. Ûriya tevî peyamekê şand eniya şer. Peyam ji serpêl re digot ku, divê Ûriya teqez di şer de bimire.

Dema Ûriya mir, Dawid, Bet-Şeba bi jinitî ji xwe re stend. Xwedê, Xizmetkarê xwe Natan, bona ku gunehê Dawid nîşanî wî bide şand. Natan ji Dawid re di derbarê zilamekî dewle-mend û zilamekî xizan de çîrokekê got. Bi sedan mihên zilamê

dewlemend hebûn. Lê belê berxikek tenê yê zilamê xizan hebû û mîna qîza xwe li berxikê dinêriya. Dema mêvaneke ji zilamê dewlemend re hat, yê dewlemend bona wî têr bike tu ji mîhên xwe serjê nekir. Lê li dêvila vê yekê, berxika zilamê xizan serjê kir. Dawid ji ber ezperestiya zilamê dewlemend gellekî hêrs bûbû. Bi gotina: "Zilamê ku wisa kiriye dê teqez bimire!" qêriya. Natanê dilawêr: "Ew zilam tu yî!" got ji Dawid re.

Tiştê ku Dawid kiriye, ji kirina zilamê di çîrokê de yî xerabtir bû. Xwedê ji Dawid re nîşan da ku, ew çi qas zilamekî xerab e. Û Dawid ji ber gunehê xwe gellekî xemgîn bû. Ji Xwedê re: "Min li dijî te guneh kir û vê xerabiyê kirim" got. Û Xwedê li gunehê Dawid bexşand. Lê belê pitika Bat – Şeba gellekî nexweş bû û li pêy bûyînê demeke kurt mir.

Xwedê gunehê Dawid yê tirsehêz bexşand. Paşê jî pitikek din ya Bat – Şeba, yê ku navê wî Silêman bû û dê li pêy Dawid bibe qiral hate dinê. Lê belê zarokên din yên Dawid, ên ku jan û êşên mezin bi wî dane kişandin jî bûn.

## Qiral Dawid (Beşa 2)

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

2. Samûyêl 1 – 12

*"Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne."*

Zebûr 119:130

**Dawî**

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê

dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

---

Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin
û bi Xwedê re biaxifin!

Yûhena 3:16

---

| Ferhengok Bi Kurdî | Mini Sözlük Bi Tirkî | Mini Wörterbuch Bi Almanî |
| --- | --- | --- |
| Qiralê Îsraêlê | İsrail'in Kıralı | König von İsrael |
| Orşelîm | Yeruşalim | Jerusalem |
| Cihûda | Yahuda | Juda |
| Eşîr | Oymak | Stamm |
| Sindoq | Sandık | Lade |
| Perestgeh | Tapınak | Tempel |

## Ester a Qiralîçeya Xweşik

Demek ji nava deman de keçikek xweşik bi navê Ester hebû. Dema dê û bavê wê mirin, apê wê Mordekay wê mezin kir. Ester jî mîna keçikek qenc be, bi îtaetkirinê, apê xwe xîretdar kir.

Ester li Persê jiya, lê belê Ester ne Farisî bû, ew bi xwe Cihû bû. Bapîrên wê mîna di şer de hêsîr ketibin anîbûn Persê.

Di rojên Esterê de gellek Cihû li Persê jiyan. Pers, bona dotmîrên ji her aliyê dinê ve hatine Persê ziyafetekê mezin danî. Zilaman, ji Qiralîçe Waştî û jinên ku li ziyafetê ne cihêtir şîvê xwarin. Qiralê serxweş, bona ku taca qiraliyetê bi serê xwe ve dake û xweşikiya xwe nîşanî wan bide, destûrê da Qiralîçe Waşti. Qiralîçe Waştî jî wî red kir. Qiral, bona, pêdivî heye ku jin zilamên xwe xîretdar bikin, nîşan bide zagonek derxist ku taca Waştî ji dest wê stend. Ew êdî ne qiralîçe bû.

Bona qiralîçeyek nû lêkolîn hate kirin. Ji bilî hemî qîzên xweşik yên di qiraletiyê de ne, qiral, bona ku bibe jina wî, Esterê pejirand. Taca qiralîçetiyê li serê wê dakir. Ester ji ber ku apê wê temî lê kiribû, Cihûbûna xwe jê re negot.

Apê wê Mordekay, bona ku agahiyên di derbarê Esterê de bibihîze, hemî demên xwe di deriyê qesrê de borand. Rojekê guhdarê du peywirdarê qesrê bû ku di derbarê kuştina qiral de diaxifîn.

Mordekay îkazek di derbarê xelaskirina jiyana qiral de şand. Peywirdar hatin dardakirin û navê Mordekay derbasî qeydên dîroka qiral kirin.

Zilamê li pêy qiral herî rayedar e, zilamekî dewlemend bi navê Haman bû. Dema Haman derbas dibû her kesî li ber wî xwar dibûn. Her kes, ji bilî kesekî. Mordekay, wekî Cihûyekî, tenê bi Xwedayê Zindî diperistî.



Haman ev qasî ji Mordekay dikerihî ku, biryarek da û xwest ku wî û hemû Cihûyên li Persê ne bukujin. Çi tiştekî tirsehêz e! Hamanê xerab, bona ku di demekî diyarkirî de hemû Cihûyên di qiraletiyê de ne bêne kuştin, zagonekê bi qiral ve da qebûl kirin. Zagonek bi toqîn bû. Him Cihûyan him jî Persiyan şînê girtin. Lê belê di bîr bînin ku Xwedê Esterê kiribû qiralîçe. Û ew jî Cihû bû. Gelo dê raza xwe ji qiral veşartiya? An jî bona ceribîne ku gelê xwe xelas bike, dê rîska mirinê bidaya ber çavan?

Xwedê ramaneke biaqilî da Ester. Haman û qiral, bona ziyafetekê vexwandin. Wadê da ku li wê, qiral her çi bixwaze dê bîne cih. Bi gotina "Sibê… bila qiral û Haman werin ziyafetê." bersivand Ester. Paşê dê xwestina xwe ji qiral re bigota. Di vê navberê de Haman, bona ku Mordekay daliqîne, sêpêyek mezin amade kir.

Wê şevê qiral raneket. Dema qeydên dadgehê dixwendin, dît ku ji ber canê wî xelas kiriye, tu xelatê nedane Mordekay. Dotira rojê qiral, ji Haman ve pirsi: "Gelo bona kesekî ku qiral bixwaze wî xîretdar bike divê çi bête kirin?" Haman kêfxweş bû. Got qey qiral di derbarê Wî de dibêje.

Haman bona destûra daliqandina Mordekay hatibû cem qiral. Sêpê amade bû. Niha ev dibû ku bisekine. Bi kelecanê, Haman pêşniyarên xwe rêz kirin. "Cil û bergên qiral li zilêm kin, tacê bi serê wî dakin." "Wî li hespê qiral siwar bikin. Bona ku her kes vê yekê bibînin, ji bo li hemiya bajêr bi vî awayî bête gerandin emir bidin rêwebirekî herî bilind e." Qiral hema destûra: "Hema here û bona Mordekayê Cihû wisa bike" da Haman.

Gelo hûn, çaxa Mordekay bona ku xîretdar bikî di bajêr de gerandiye, hestê Haman çawa bûn dikarin texmîn bikin?

Ew, ji berê zêdetirî ji Mordekay ve kete girr û nefrînê. Dibe ku Haman bi ramanê: "Tenê bisekine" fikirîbe. "Dê di demek kurt de bimire, tevî hemî Cihûyên din."

Paşê, ew roj qiral û Haman çûn ziyafeta Qiralîçe Ester. Qiral bi gotina: "Daxwaziya te çiye?" pirsî. Soza ku dabû, jibîr nekiribû. Qiralîçe Ester, bi şanîdana Haman, ji qiral re, hemî pêşniyarên Haman yên xerab gotin. "Wî daliqînin!" got qiral.

Paşê qiral, zagoneke din ya ku destûrê dide xweparastina Cihûyan derxist. Xelas bûbûn. Mordekay li pêy qiral bû kesê ku herî rayedar e û hemiyên Cihû kêfxweş bûn û diyariyan dan hev. Heta îroj jî, gelê Cihû; ka Xwedê wan çawa bi navgîniya Qiralîçe Ester xelas kirine di bîra xwe de tînin.

## Ester a Qiralîçeya Xweşik

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

Ester 1 – 10

*"Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne."*

Zebûr 119:130

**Dawî**

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer

dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

---

**Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin**
**û bi Xwedê re biaxifin!**

Yûhena 3:16

---

| **Ferhengok Bi Kurdî** | **Mini Sözlük Bi Tirkî** | **Mini Wörterbuch Bi Almanî** |
|---|---|---|
| Pers | İran | Persien |
| Farisî | İranlı | Perser |
| Cihû | Yahudi | Jude |
| Ap | Amca | Onkel |
| Zagon | Kanun | Gesetz |
| Sêpê | Darağacı | Galgen |

## Zilamên ku Natewin

Qiral Nebûkadnetsar peykerek zêrînî yê mezin e da avakirin. Ji serî heta binî ji zêr ve hatibû avakirin. Dibe ku qiral, xewna xwe ya tê de Xwedê jê re gotibû qiraletiya te ya zêrînî heta bêdawîbûnê nadome, jibîr kiribe. Dibe ku ew bi xwe bi ramanê, ger peykerek bitûmî ji zêr e ava bike, dê Gotina Xwedê neye cih, tevgeriyabe.

Yek ji peywirdarên qiral, destûrê ji hemiya gel re xwendin: "Hûn ê bi rû herin erdê û bi peykerê zêrînî ve biperistin… Her kî ku neçe erdê û neperiste dê bi nava firna bi pêt û agir ve bête avêtin."

Ji bilî sê zilamî, her kes li gor daxwaziya qiral kirin. Ev zilaman Cihû bûn. Vana hevalên Danîêl Şadrak, Meşak û Abed-Nego bûn. Wisa tête xuyakirin ku Danîêl wê demê ne li wê bû, mihaqqeq ew ê jî bi pûtekî karê destê mirovan e peristinê red bikira.

Zilamên qiral yên zanyar çavnebariyê li Danîêl û hevalên wî re dikirin, ji ber ku qiral ji wan hez dikir. Bi vî awayî wisa gotin: "Li bajarê Babîlê sê zilamên ku te bi peywirên bilind wan peywirdar kirine; Şadrak, Meşak û Abed-Nego. Van zilamana, ya qiral bi te îtaetê nakin. Ji îlahên te re qûlitiyê nakin, bi peykera zêrîn ya ku te çikandiye naperistin."

Qiral Nebûkadnetsar nexwest ku van zilaman biceza bike, lê belê ji berê de gotibû ku her kî li gor emirê wî neke, dê bête biceza kirin. Bona ku fikrên xwe biguherin lava ji wan re kirin. "Ger hûn neperistin hûn ê bi nava firneya ku bi agir û pêt e bêne avêtin. Û ma dê kîjan Xwedê we ji destê min xelas bike?"

Qiral xeletiyek mezin dikir. Ew li dijî Xwedayê ku bi rastî jî Zindî ye derdiket. Her sê zilamên Cihû, dizanîbûn ku bi peykerekê peristin, li dijî Zagona Xwedê derketin e. Li ser pêlan sekinê domandin. Ji ber ku bi Xwedê ve ewle bûn, ji qiral neditirsiyan. Bersivek van her sê zilamên dilawêr bona qiral hebû. Gotin ku: "Xwedayê me, yê ku em qûlitiyê jê re dikin, dikare me ji firna sor xelas bike. Ger xelas neke jî, bi vêya bizanibe ku; ya qiral, em ê qûlitiyê ji îlahên te re nekin, bi peykera zêrînî ya ku te çikandiye peristinê nekin."

Qiral Nebûkadnetsar hêrs bû! Emir da ku bila firne ji her carî, heft qatî zêdetir bête sor kirin. Zilaman hê neditewiyan. Qiral, ji hinek leşkerên di artêşa xwe de yên xwurtin re destûrê da ku bila Şadrak, Meşak û Abed-Nego girê bidin û bavêjin firna sor.

Firne ev qas sor bû ku, zilamên Şadrak, Meşak û Abed-Nego avêtin êgir, ji ber germiya wê mirin.



Qiral ji dûrbûnek ewle temaşe kir. Dît ku her sê zilamî avêtin nava firna ku sor bûye. Lê belê tiştê ku dît ne tenê ev bû. Qiral Nebûkadnetsar şaş bûbû! Bi gotina: "Ma me sê zilamên girêdayî neavêtin nava êgir?" ji alîkarên xwe re pirsîn. Wan jî bi gotina: "Belê" wî bersivandin. "Binêrin! Ez çar zilamên ku ji benên xwe filitî di nava êgir de dimeşin û xesarê nabînin dibînim. Û yê çaremîn jî wekî Lawê Îlahan e!" got.

Nêzîkî deriyê firna sor bû û bi gotina: "Şadrak, Meşak û Abed-Nego, qûlên Xwedayê Herî Bilind, derkevin derve!" bang kir. Paşê Şadrak, Meşak û Abed-Nego ji firna sor ve derketin derve.

Her kes li dora wan civiyan û çavdêriyê li sê Cihûyî kirin. Dîtibûn ku, bona wan bişewitînin tu hêza agir nîne. Porên wan û cil û bergên wan neşewitîbûn. Heta bêhna êgir jî ji wan nedihatin. Çaxa hay jê çêbû ku çi bûye: Qiral Nebûkadnetsar tiştekî gellekî bi baqilî kir. Dua kir û: "Bila pesnahî ji Xwedayê Şadrak, Meşak û Abed-Nego, Yê milyaketê xwe şand û qûlên xwe yên bi Wî ewle bûne xelas kirine re be!" got.

**Zilamên ku Natewin**

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

Danîêl 3

*"Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne."*

Zebûr 119:130

**Dawî**

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

---

Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin
û bi Xwedê re biaxifin!

Yûhena 3:16

---

| Ferhengok Bi Kurdî | Mini Sözlük Bi Tirkî | Mini Wörterbuch Bi Almanî |
|---|---|---|
| Cihû | Yahudi | Jude |
| Heval | Arkadaş | Freunde |
| Çavnebarî | Kıskançlık | Neid |
| Firne | Fırın | Ofen |
| Agir | Ateş | Feuer |

## Danîêl û Kortala Şêran

Daryûs bû qiralê nû yê Babîlê. Yekî baqil bû. Bona ku ji rêvebiriyê re bibin alîkar, ji qiraletiya xwe ve sed û bîst zilamê ku herî qenc in hilbijartin. Paşê ji wan sisêyan mîna berpirsiyaran hilbijartin. Danîêl ji wan sê zilaman yek bû.

Qiral Daryûs gellekî rêz û hurmetê nîşanî Danîêl kir, dixwest ku wî bike rêvebirê berpirsiyarê hemiya qiraletiyê. Lê serekên din çavnebar bûn. Plansaziyekê ava kirin ku dê di Danîêl de xeletiyekê bibînin û bi vî awayî di navbera wî û qiral de pirsgirêkê derxînin.

Her çi qas ceribandin bila biceribînin, van serekan di derbarê Danîêl de tu tiştekî xerab nedîtin. Danîêl di her tiştê ku dikir de dilsozî qiral bû. Û ji aliyê din ew gellekî balkêş û baqil bû û her tim tiştê ku ji destê wî tê bi awayekî herî qenc çêdikir.

Serekên çavnebar, dizanîbûn bona dafikê bavêjin ber Danîêl tenê rêyek heye. Wan dizanîbûn ku li rûyê erdê tu tişt nîne ku peristina wî, ya bi Xwedayê Îsraêlê re bisekinîne.

Neyarên Danîêl planekî fikirîn. Bona ku qiral destxetî bike zagonek nû amade kirin. Zagon digot ku; divê her kes tenê bona Qiral Daryûs dua bikin. Kesê ku bêîtaetiyê bike, dê biavêtina kortala şêran!

Qiral Daryûs zagona nû destxetî kir. Zagona nû bona Danîêl tu guhertinê nekir. Her tim tiştê ku dikir, wisa kir. Li ber şivaka xwe ya vekirî, rojê sê carî çok danî û ji Xwedayê Buhuştê re dua kir.

Serekên çavnebar, bona ku ji qiral re bibêjin banz dan. Bona qiral ji qefaltina Danîêl wêdetir vebijarkek nîn bû. Divê li zagonê îtaetkirin hebûya. Divê Danîêl bimira. Qiral gellekî li ser mijûl bû lê bona guhertina zagonê rê û çareyekê nedît.



Danîêl bi kortala şêran ve hate avêtin û wî bi mirinê ve mehkûm kirin. Danîêl berî ku ji şêrên birçî ve bête avêtin, Qiral Daryûs jê re wisa got: "Bila Xwedayê ku tu her tim qûlitiyê jê re dikî te xelas bike!"

Qiral wê şevê raneket. Dotira rojê gellekî zû, bi lezî çû kortala şêran. Qiral Daryûs bi gotina: "Danîêl, qûlê Xwedayê Zindî! Gelo Xwedayê ku tu her tim qûlitiyê jê re dikî, te ji şêran xelas kir?" qêriya. Dibe ku ne li benda bersivekê be. Lê belê Danîêl bersiv da! Danîêl bi gotina: "Ya Qiral, Xwedayê min milyaketê xwe şand û devê şêran girtin, wisa ku bila xesarê nedin min! Û wekî din, ya qiral, min li dijî te tu çewtiyî nekir" bang kir.

Qiral Daryûs kêfxweş bû! Destûr da ku Danîêl hema ji kortalê derxînin. Qiral dizanîbû ku Xwedê Danîêl xelas kiriye û neyarên Danîêl neyarên Xwedê ne. Destûrekê da û yên ku bona zagona xerab destxetî bikin wî xapandine bila bi kortala şêran ve bêne avêtin. Şêran wan xwarin.

Qiral Daryûs, xwest ku dinya pê bizanibe Xwedayê Ezmanan, xizmetkarê xwe yê dilsoz Danîêl parastiye. Qiral, bona ku her kes bi Xwedayê Zindî ye re peristinê bikin peyamekê nivîsand. Û qiral, xîret û serekatiya Danîêl anî rewşa wî ya berê.

**Danîêl û Kortala Şêran**

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

Danîêl 6

*"Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne."*

Zebûr 119:130

**Dawî**

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

---

Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin
û bi Xwedê re biaxifin!

Yûhena 3:16

---

| Ferhengok Bi Kurdî | Mini Sözlük Bi Tirkî | Mini Wörterbuch Bi Almanî |
|---|---|---|
| Kortal | Çukur | Graben |
| Şêr | Aslan | Löwe |
| Neyar | Düşman | Feind |
| Destxet | İmza | Unterschrift |
| Şivake | Pencere | Fenster |

## Yûnis û Masiyê Mezin

Zilamekî bi navê Yûnis beriya gellek salan, li ser axên Îsraêlê jiya. Rojekê Xwedê jê re, got ku bila biçe welatê Nînowa ya li dinê herî xwurt û mezin e. Dê Yûnis mirovên li wê ne, di derbarê ku Xwedê dizane ew çi qas mirovên xerab in de, hişyar bikirana. Lê Yûnis bêîtaetiyê ji Xwedê re kir! Li dêvila ku biçe Nînowa, Yûnis li keştiyekê siwar bû û ber ve cihê bi navê Tarşîşê ye û li çewta wê ye ve çû.

Xudan Xwedê bayekî dijwar şand ser behrê. Bahozeke xwurt hebû! Bahrevanan ji bo jihevbûn û noqbûna keştiyê tirsiyan. Bahoz bêtir û xerabtir bû. Bi awayekî bizdiyayî bahrevanan ji xwedayê xwe re dua kirin û bona keştiyê siviktir bikin hemî barê keştiyê avêtin behrê. Lê belê ji tiştekî re nebû çare. Kesê ku di keştiyê de dua nake, tenê Yûnis bû. Lê dêvila wê di nava keştiyê de raza bû û bi xewekî rehet radiket.

Naxudayê keştiyê wî dît. “Ma bi razanê tu çi dikî? Rabe! Ji Xwedayê xwe re dua bike! Dibe ku Xwedê me bifikire, bi vî awayî em ê tune nebin.”

Piştî demekî par, bahrevanan biryar dan ku pirsgirêk di derbarê Yûnis de yî. Yûnis ji wan re got ku ew ji XUDAN ve direve. Wan jî bi gotina: “Gelo bona behr ji bo me aş bibe, divê em çi bi te bikin?” pirsîn. Yûnis bi gotina: “Hema min rahêjin û bavêjin behrê!” bersiv da wan. “Ez bawer im ku hûn ji ber min ketin toqa vê bahoza tirsehêz.” Bahrevanan nedixwestin ku Yûnis bavêjin behrê. Ji ber vê yekê, bona ku keştiyê ber ve reşahiyê bibin, zêdetirê bêrikan kêşandin. Lê belê bi ser neketin.

Tenê tiştek mabû ku bikin! Piştî ku bona bexşandinê dua kirin, bahrevanan girtin û Yûnis avêtin behrê. Dema Yûnis di nava şepêlan de winda dibû, behr aş bû û ba jî rawestiya.



Ev rewşa hewayê, bahrevanan ji bahozê bêtir tirsandin. Divê bizanîbûna ku tenê Xwedê dikare wisa bike. Di nava tirs û matmayîbûnê de peristinê ji XUDAN re kirin.

Di vê navberê de bona qasidê bêîtaet surprîzeke mezin hebû. Çawa ku bi bêçaretî noqî kûrahiyên behrê dibû, Yûnis dizanîbû ku tu tişt nikare wî ji xeniqandinê xelas bike. Ew ê jî bifetisiya, lê belê planên wekî din ên Xwedê hebûn.

XUDAN, bona ku Yûnis daqurtîne masiyeke mezin amade kiribû. Masî tam di wexta xwe de li wê bû! Di qurtînekê de Yûnis li derveyî behrê û di zikê masî de bû.

Yûnis sê rojî di zikê masî de ma. Bona raman û duakirinê wexta wî çêbû. Piştî sê rojî, ya dawîn Yûnis, ji Xwedê re bona îtaetkirinê soz da. Tam di wê demê de Xwedê ji masî re axifî û masî Yûnis verşiya peraxê.

Carekê din Xwedê ji Yûnis xwest ku bila biçe Nînowa û gotina Xwedê waaz bike. Vê carê Yûnis çû! Yûnis bi qêrînê kete bajêr: “Çel rojê din dê Nînowa xera bibe!” Gelê Nînowa bi gotina Xwedê ve bawer bûn. Bona ku nîşanî Xwedê bidine ku ji ber gunehên xwe xemgîn in, xwarinê nexwarin û kincên pertal li xwe kirin.

Heta bigihêje qiral jî xwe li ber Xwedê nizm kir. Ji textê xwe daket, cilên pot û pertalî li xwe kirin û di nava xweliyan de rûnişt. Emir da her kesî ku bila ji rêyên xwe yên xerab û tundiyê vegerin û bona ku Xwedê li wan bibexşîne dua bikin.

Xwedê li wan BEXŞANDIN! Dema mirov hay jê çêbûn ku Xwedê li wan bexşandine, divê li Nînowa rojek nûwaze ya şabûnê bûbe… Lê belê kesek qariyayî bû. Yûnis!

Gelo çima Yûnis qariyayî bû. Ji Xwedê re wisa got: "Min dizanîbû ku tu Xwedayek xêrxwaz, dilovan, zû hêrs nabe û hezkirina Wî bêdawîn e." Bi gotineke din, Yûnis dizanî bû ku Xwedê, her tim yên ji gunehên xwe poşman dibin û ji Gotina Xwedê re îtaet dikin dibexşîne. Wisa xuya dibû ku Yûnis ji gelê Nînowa hez nedikir û bexşandina wan nedixwest.

Yûnis gellekî bi Xwedê ve hêrs bûbû ku wisa got: "Canê min ji min bistîne; ji ber ku bona min, mirin ji jiyanê ve qenctir e!"

Yûnis bona ku bibîne ka dê Xwedê ji niha pê ve çi bike, derket derve bajêr. Xudan Xwedê gihayek pelmezin amade kir. Bi awayekî lezgîn mezin bu û hemiya rojê bi siya xwe Yûnis ji tava germ parast.

Dotira rojê Xwedê kurmikek ku gihayan dukuje şand. Paşê Xudan bayekî germ û xurt amade kir û heta ku Yûnis mirina xwe bifikire da bakirin. Hemiyên vana Yûnis hê jî hêrs kirin.

Paşê Xudan ji Yûnis re: "Ma gelo bona hêrsbûnê mafê te heye? Dilê te bi kerçîka ku te mezin nekiriye û kedê nedaye şewitî. Di şevekê de derket û di şevekê de tune bû. Ma gelo çima ez ê dilovaniyê li Nînowayê, li wî bajarê mezin ê ku bi hezaran mirovên wê hene, nekim?"

**Yûnis û Masiyê Mezin**

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

Yûnis

*"Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne."*

Zebûr 119:130

**Dawî**

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

---

Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin
û bi Xwedê re biaxifin!

Yûhena 3:16

---

| Ferhengok Bi Kurdî | Mini Sözlük Bi Tirkî | Mini Wörterbuch Bi Almanî |
|---|---|---|
| Bahoz | Fırtına | Sturm |
| Keştî | Gemi | Schiff |
| Zik | Karın | Bauch |
| Naxuda | Kaptan | Kapitän |
| Perax | Sahil | Ufer |
| Kerçîk | Kene otu | Rizinus |

# Peymana Nû

## Bûyîna Îsa Mesîh

Beriya gellek salan, Xwedê milyaketê xwe Cibrayîl, şand cem keçikek Cihû û gellekî şêrîn e. Jê re: "Dê lawekî te bibe û navê Îsa lê bike. Ew ê bi navê Lawê Yê Herî Mezin e bête bangkirin. Dê heta abadîniyê serweriyê biajo.



Keçik bi awayekî şaş mayî, bi gotina: "Ma dê ev çawa bibe?" pirsî. "Ez qet neçûme cem zilamekî." Milyaket, ji Meryemê re: "Lawê dê ku bibe, ji Xwedê ye" got, "Dê bavê wî yê ne dinyewî be."

Milyaket paşê ji Meryemê re got ku meriva te Elîzabet jî, tevî temena xwe ya mezin dê pitikek wê bibe. Ev jî mûcîzetek bû. Piştî demekî kurt Meryem çû serîdanka meriva xwe Elîzabet. Pev re pesnahiyan pêşkêşî Xudan kirin.

Meryem bi xortekî navê wî Ûsiv e dergistî bû û li hêviya zewacê bû. Gava Ûsiv bihîst ku Meryemê li benda pitikekê yî, gellekî xemgîn bû. Got qey bavê pitikê kesekî din e. Di xewnek xwe de, milyaketê Xwedê ji Ûsiv re got ku ev zarok Lawê Xwedê ye. Ûsiv di xwedîkirina Îsa de, dê alîkariyê ji Meryemê re bikira. Ûsiv bi Xwedê re ewle bû û îtaet kir. Û ji aliyê din bi rêzikên welatê xwe re jî îtaet kir.

Ji ber zagoneke nû, Ûsiv û Meryem bona ku bacên xwe bidin ji Beytlêhemê cuda bûn.

Dema welidandina Meryemê hat. Lê belê Ûsiv cihekî mayînê nedît. Hemî xan tijî bûn. Ûsiv ya dawîn axurekê dît. Îsayê pitik li wê hate dinê. Diya Wî, Wî dirêjî êmlikek bi piranî êmên ajalan dixinê, kir.

Di nêzîka wan de şivanan li keriyên xwe yên mexel hatine dinihêrtin. Milyaketê Xwedê xwe nîşanî wan da û agahiya nuwaze da wan. "Îroj bona we, li bajarê Dawid Xudan Mesîhê ku Xelasker e hatiye dine!" Nişkav de milyaketên ku gellekî dibiriqin û bi gotinên: "Bila ji Xwedayê ku li herî bilindahiyan e re bilindahî bibe, bila xêr û xweşî ji mirovên ku li rûyê erdê Ew ji wan dilxweş in re be", … … pesnahiya Xwedê didin xuya



bûn. Şivanan bi lezî çûn axurê. Piştî ku pitikê dîtin, ji her kesî re di derbarê milyaketên ku bi wan xuya bûne û agahiya Îsa dayîne de gotin.

Piştî çel rojî, Ûsiv û Meryem, Îsa anîn perestgeha ku li Orşelîmê ye. Dema Hanaya kal ya xizmetê ji Xwedê re dike, dua dikir,

zilamê bi navê Şîmûn jî bona pitikê pesnahiyan pêşkêşî Xwedê kirin. Her duyan jî dizanîbûn ku Ew Lawê Xwedê û Xelasker e. Ûsiv du kevokan qurban kirin. Ev, li gora zagona Xwedê, dema mirovên xizan zarokên xwe di rêya Xwedê de dinezirînin pêşkêşiyên ku dê bianiyana bûn.

Piştî demekî din, stêrkek, rênîşanî stêrknasên ku ji rojhelatê ve hatine Orşelîmê, da. Bi gotina: "Qiralê Cihûyan, Yê ku hatiye dinê li ku derê yî?" pirsîn. "Em dixwazin ku bi Wî biperistin!"



Qiral Hêrodês di derbarê Stêrknasan de bihîst. Bi awayekî dil-tepînî ji Stêrknasan xwest ku dema Îsa bibînin agahiyê bidine wî. “Ez jî dixwazim bi Wî biperistim.” Lê derew dikir. Hêrodês dixwest ku Îsa bukuje.

Stêrk, bi awayekî bêkêmasî mala ku Meryem û Ûsivê tevî pitikê dimînin, nîşanî stêrknasan kirin. Çok danîn û bi Wî peris-tîn û bi diyarî zêr û bêhnên xweş danê.

Xwedê stêrknasan hişyar kirin ku bila bi awayekî dizîka vege-rin malên xwe. Hêrodês gellekî hêrs bûbû. Bona kuştina Îsa biryardar bû, rêvebirên dilxerab hemî pitikên mêr yên li Beyt-lehemê kuştin. Lê belê Hêrodês hêz neanî ku xesarekê bide Lawê Xwedê.

Ûsivê ku di xewna xwe de hate îkaz kirin, Meryem û Îsa bi awayekî ewlekar birin Misirê. Gava Hêrodês mir, Ûsiv, Meryem û Îsa ji Misirê şunda anîn. Di nêzîkî Gola Celîlê de, li bajarekî Nisretê ya biçûk de jiyana xwe domandin.

## Bûyîna Îsa Mesîh

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

Meta 1 – 2, Lûqa 1 – 2

*“Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne.”*

Zebûr 119:130

**Dawî**

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê

dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

---

Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin
û bi Xwedê re biaxifin!

Yûhena 3:16

---

| Ferhengok Bi Kurdî | Mini Sözlük Bi Tirkî | Mini Wörterbuch Bi Almanî |
|---|---|---|
| Milyaket | Melek | Engel |
| Stêrknasan | Yıldızbilimciler | Sterndeuter |
| Stêrk | Yıldız | Stern |
| Pesnahî | Övgü | Lob |
| Bac | Vergi | Steuer |
| Zayan | Doğum | Geburt |

## Bona Îsa Demek Xerab

Dema Îsa waftîz bû, Xwedê got: “Lawê Min yê Xoşewîst Ev e. Ez ji Wî dilxweş im!” Ruhê Xwedê yê Pîroz, mîna kevokekê daket ser Îsa.

Piştî demek kurt, Ruhê Xwedê yê Pîroz, Îsa bir cihekî tena. Îsa tenêbû. Îsa çel roj rojiyê girt. Yanê Îsa tu tiştekî nexwar û venexwar. Gellekî birçî bû. Încîl dibêje ku li wê ajalên hov jî hebûn.



Îblîs bona Îsa biceribîne hat. Berî demekê dirêj Adem û Hawa jî li bexça Adenê, bona ji Xwedê re îtaetê nekin wan ceribandibûn. Niha jî dê Îsa bihata ceribandinê. Îblîs heta bona ceribandina Lawê Xwedê jî hewl dida.

Îblîs: "Ger tu Lawê Xwedê be, ji vî kevirî re bibêje, bila bibe nan", got. Îblîs dizanîbû ku Îsa birçî ye. Dizanîbû ku Lawê Xwedê dikare keviran jî bike nan. Gelo dê Îsa li ber Îblîs hustî xwar bikira an na?

Na! Îsa li ber Îblîs hustî xwar nekir. Lê li dêvila vêya Wî, bi Gotina Xwedê bersivê da. "Mirov tenê bi nan najî, lê belê bi her yek gotina ku ji devê Xwedê ve derdikeve dijî."

Paşê Îblîs, Îsa hilkişand ser perestgeha Orşelîmê ya pîroz, ya ku mirov tê de peristinê ji Xwedê re dikin. Gelo li pêy vêya dê Îblîs çi bikira? "Ger tu Lawê Xwedê be, xwe ji vê bavêje xwarê", got. "Di Gotina Xwedê de; dê milyaket te biparêzin, tête gotin." Îsa bi gotina: "Na" bersivê da, "Wekî din… 'Tuyê Xudan Xwedayê xwe neceribîne' jî hatiye nivîsandin."

Îblîs dîsa ceriband. Îsa hilkişand girê li bajêr yê herî bilind e. Welatên dinê tevî hemî rewnaqiyên wan nîşanî wî da û: "Ger tu bi erdê ve secde bikî û peristinê ji min re bikî ez ê hemiyên vana bidime te" got.

Îsa: "Vekişe here, Îblîs!" got. "Bi gotina: 'Tuyê bi Xwedayê xwe Xudan ve biperistî û tenê ji Wî re qûlitiyê bikî,' hatiye nivîsandin."

Paşê ku Îblîs, Îsa berda û çû, tiştekî nûwaze bû. Xwedê bona ku xemrevîniyê li Lawê xwe Îsa yê ku ji Îblîs re îtaet nekiriye bikin û Wî biparêzin, milyaketên xwe şandin.

**Bona Îsa Demek Xerab**

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

Meta 4, Lûqa 4

*"Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne."*

Zebûr 119:130

**Dawî**

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

---

Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin
û bi Xwedê re biaxifin!

Yûhena 3:16

---

| **Ferhengok Bi Kurdî** | **Mini Sözlük Bi Tirkî** | **Mini Wörterbuch Bi Almanî** |
|---|---|---|
| Îblîs | Şeytan | Teufel |
| Ceribandin | Denemek | Versuchung |
| Birçi | Acıkmak | Hunger |
| Nan | Ekmek | Brot |
| Rewnaqî | Görkem | Herrlichkeit |

## Mûcîzetên Îsa Mesîh

Îsa gellek mûcîzetan kirin. Mûcîzet nîşan didin ku Îsa bi rastî jî Lawê Xwedê ye.

Mûcîzeta yekem di şîva dawetê de bû. Pirsgirêkek derket. Têra her kesî xemr tunebû. Meryema dayika Îsa pirsgirêkê ji Wî re got, paşê ji yên ku di dawetê de xizmet dikin re got ku, Îsa her çi ji we re bêje, wê bikin!

Îsa got: "Van feraxan bi avê ve dagirin. Wan dikarîbûn pirsa "bi avê?" bipirsiyana. Belê, tiştê ku Îsa rica kiribû, av bû. Îsa paşê ji xizmetkarekî re got ku bila ji feraxa mezin rahêje û bibe bi berpirsiyarê dawetê ve bide tahmkirin. Av niha xemr bû! Xemra qenc! Xemra herî qenc!

Yên xizmetê dikin gellekî ecêb man. Îsa avê wergerand û kir xemr. Hew Xwedê dikarîbû mûcîzetên wisa bikirana.

Îsa mûcîzetên wekî din jî çêkirin.

Şevekê Ew û şagirtên xwe çûn mala Pêtrûs. Xwesiya Pêtrûs bi awayekî şewat nexweş bû. Îsa destê xwe da destê jinika nexweş. Di heman demê de qenc bû. Jinik rabû ser pêlan û xizmetê ji Îsa û şagirtên Wî re kir.

Wisa xuya dibû ku, wê şevê hemî bajar li ber derî civiyabûn. Mirovên nexweş hatin; kor, kerr, lal, kud. Heta mirovên ku ruhê xerab di wan de ne jî hatin cem Îsa.

Îsa, Xelaskerê dinê dikarîbû alîkariyê bikira. Îsa alîkariyê kir. Her kesên ku hatin digel Wî qenc bûn. Yên ku di tûmiya jiyana



xwe de bi darên binçengan kûçelanî bûne, êdî dikarîbûn bimeşiyan, banz bidana û hol bibûna.

Mirovên ku bi cizamê kirêt bûne, dema Îsa wan qenc kirin bitûmî paqij bûn.

Mêr û jinên ku ji ber ruhên xerab janê dikêşin jî li ber Îsa sekinîbûn. Îsa destûrê da ruhên xerab ku bila ji mirovan cuda bibin. Dema ruhên xerab bi gotina Îsa kirin, mirovên bizdonek û bedbext aş bûn û bi şabûnê tijî bûn.

Di nava ajaweyê de çar zilam, bona ku hevalê wan bigihêje Îsa, alîkariyê bi wî re dikirin. Lê belê ew ji ber ajaweyê nêzîkî Îsa nebûn. Ma ka dê çawa nêzîk bibûna? Çar hevalên dilsoz, hevalê xweyî nexweş hilkişandin ser xaniyê malê û ji xanî ve daxistin hundirê xanî. Niha kesê nexweş nêzîktirî Îsa bû. Îsa dît ku baweriya her çar hevalî hene. Ji kesê nexweş re: "Li gunehên te hatin bexşandin. Livînên xwe rahêje û bimeşe!" got. Zilam bi başbûnê û xwurtî rabû ser pêlan. Îsa wî baş kir.

Piştî demek kurt, Îsa û şagirtên xwe di lotkeyê de bûn. Bahozek dijwar behrê li hev xist. Îsa radiziya. Şagirtên ku gellekî tirsiyan Îsa hişyar kirin û bi gotina: "Efendiyê me, me xelas bike!" qêriyan. "Em dikin bimirin." Îsa bi gotina: "Aş bibe!" emir da behrê. Di wê demê de behr aş bû. Şagirtên Wî di nava hev de bi gotina: "Ev zilamekî çawa ye?" diaxifîn. "Heta ba û behr jî îtaetê ji Wî re dikin." Wan bawerî anîn ku Îsa Lawê Xwedê yî, ji ber ku mûcîzetên ku kirine, rewnaqiya Wî nîşan didan.

**Mûcîzetên Îsa Mesîh**

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

Meta 8-9, Marqos 1-2, Marqos 4, Lûqa 4, Lûqa 8, Yûhena 2

*"Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne."*

Zebûr 119:130

**Dawî**

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

---

Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin
û bi Xwedê re biaxifin!

Yûhena 3:16

---

| Ferhengok Bi Kurdî | Mini Sözlük Bi Tirkî | Mini Wörterbuch Bi Almanî |
| --- | --- | --- |
| Dawet | Düğün | Hochzeit |
| Pirsgirêk | Sorun | Problem |
| Xemr | Şarap | Wein |
| Şagirt | Öğrenci | Jünger |
| Ajawe | Kalabalık | Volksmenge |
| Lotke | Kayık | Boot |

## Samîriyiyê Qenc

“Mamosteyê min, gelo bona ku ez jiyana bêdawîn bistînim çi bikim?”

Yê ku pirsê dipirsiya, pisporê Zagona Pîroz bû, dixwest ku Îsa biceribîne. “Gelo Zagona Xwedê dibêje çi?” “Ji Xwedê hez bike û ji cîranê xwe hez bike!” got zilam. “Lê belê cîranê min kî ye?”

Îsa, bona ku pirsa zilêm bibersivîne, çîroka zilamekî ku ji Orşelîmê çûye Erîhayê jê re got. Rêbiran êrîşî zilam kirin. Her tiştên ku dîtin, heta cilên zilam jî dizîn. Him jî wî bi xedarî birîndar kirin, wî bi nîv mirîtî danîn kêleka rêgehê.

Li ser şensa wî kahînek ji nêzîka wî derbas dibû. Bi biryarî dê alîkariyê bi zilamê birîndar re bikira. Na! Dema zilamê ku xwîn jê diherike dît, derbasî aliyê dinî rê bû.

Piştî demeke din, dengê pêlan, têgihand ku yekî din nêz dibe. Ev zilama yek ji Lêwiyiyan bû û di perestgehê de alîkariyê bi kahînan re dikir. Çû û li zilamê birîndar nihêrt, paşê alîkariyekê pê re nekir û çû.

Ya dawîn yekî Samîriyî hate. Cihû ji Samîriyiyan dikerihîn. Gel bi hêviya yê Samîriyî nebe leheng, Îsa guhdarî dikirin. Lê belê ew bû leheng.

Yê Samîriyî girîngiyê da zilamê birîndar û bona ku alîkariyê bike sekinî. Yê Samîriyî çok danî û hêdîka îlacê di birîna zilamê biyan de da û birîna wî pêçand. Paşê zilamê birîndar li kerê xwe siwar kir. Di xana ku li qeraxa rêgehê de yî, yê Samîriyî di hemiya şevê de li zilamê birîndar nihêrt. Serê sibehê, bona

ku heta baş bibe li zilamê birîndar binêre, pere da peywirdarê xanê.

Çîrok qediya. Îsa, pirsa: "Cîranê zilamê birîndar kî bû?" pirsî. Pisporê Zagona Pîroz, bi gotina: "Cîranê wî, Samîriyî yê ku alîkariyê pê re kiriye bû" bersivê dayê. Îsa got: "Herin û wisa bikin." Cîran her yekê ku di nava pêdiviyê de yî. Em dikarin bi alîkariya mirovên motaciya wan hene, hezkirina xwe nîşan bidin.

Dê ev yek Xwedayê me dilxweş bike.



**Samîriyiyê Qenc**

*Ji Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ve çîrokek*

Meta 8-9, Marqos 1-2, Marqos 4, Lûqa 10

*"Daxuyanîkirina Gotinên Wî ronahiyê diweşîne."*

Zebûr 119:130

**Dawî**

Ev çîroka ji Kitêba Pîroz e, di derbarê Xwedayê me yê nûwaze, yê me afirandine û dixwaze ku tu Wî binasî de ye. Xwedê dizane ku em tiştên ku Wî navê gunehê dane dikin. Cezaya gunehê mirin e. lê belê ji ber ku Xwedê gellekî ji me hez dike, Berxê xwe yê yekane, Îsa, bona ku li ser Darexaçê ji bo me bibe qurban û cezayê me bikêşe şand. Ger hûn bawer bikine ku rastî ev e, vana ji Xwedê re bibêjin: Ya Îsayê Xoşewîst, ez bawer dikim ku Tu Xelaskerê dinê yî û ji bo ku tu bona gunehên min bimire Tu bûyî qurban û niha dîsa jî dijî. Ji kerema xwe re were jiyana min û li gunehên min bibexşîne, wisa ku, bona ez rojekê heta bêdawîbûnê li gel Te bim bikaribim biçim, niha bibim xwediyê jiyana nû. Bona ku ez mîna zarokê Te bim, ji Te re îtaetê bikim û bona te bijîm alîkariyê bi min bike. Amîn.

---

Her roj Kitêba Pîroz Bixwînin
û bi Xwedê re biaxifin!

Yûhena 3:16

---

| **Ferhengok Bi Kurdî** | **Mini Sözlük Bi Tirkî** | **Mini Wörterbuch Bi Almanî** |
|---|---|---|
| Zagona Pîroz | Kutsal Yasa | Das Heilige Gesetz |
| Rêbir | Haydut | Räuber |
| Kahîn | Kâhin | Priester |
| Lêwiyek | Bir Levili | Ein Levit |
| Biyan | Yabancı | Fremde |
| Xan | Han | Herberge |

## Îsa Mesîh Bahozê Aş Dike

Dema bahozek mezin derket, Îsa û şagirtên xwe di lotkeyê de bûn. Bahoz, bi xeydek mezin behra Celîleyê dikuta. Ev bahoz dikarîbû bibûya sedema noqbûna lotkeyê û fetisandinan. Bahoz şagirtan gellekî tirsandin. Pêlan dor û ber li lotkê girtibûn û hundirê wê bi avê ve dagirtibûn.

Lê belê Îsa serî li ser balîfekê di xewek kûr de bû. Şagirtan Îsa hişyar kirin. Bi qêrîneke: "Efendiyê me, Efendiyê me em dimirin!" qêriyan.

Îsa bi gotina: "Ma çima hûn ditirsin hey bawerîkêmno?" ji şagirtên xwe ve pirsî. Paşê Îsa emir da bahozê ku aş bibe... Û... emir da pêlên digurmin, ku bila bêdeng bibin. Û BAHOZ AŞ BÛ... BEHR SEKINÎ Û BÊDENG BÛ.

Şagirtan bi şaşitiyeke mezin: "Ma gelo Ev kî ye? Heta behr û bahoz jî li ber Wî serî datînin!" gotin.

Piştî demeke din, rojek din ya ku Îsa mijûl e bû. Ji pênc hezarî zêdetir kes Wî dişopandin. Xwedê bi hêza xwe vê ajaweya mezin bi xwarina nîvroj ya gedekî biçûk e, têr kirin.

Niha êvar bû û Îsa ajaweyê şandin malên wan. Divê heta şagirtan jî biçûna. Îsa wan berî xwe bona ku derbasî rexa din ya gola Celîlê bibin li lotkeyê siwar kirin. Dema wan lê siwar kirin, Îsa tena serê xwe bona ku dua bike çû çiya.

Gava bû êvar Ew, li wê tenê bû. Şagirtan di dûrê golê de ketin nava bahozekê. Bahoz astengiyê derdixist ku derbasî rexa din